



T.C.

Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

DI NAV ÇANDA KURDÎ DE ÇÎROKÊK SÎNDRELLA

Halil İÇEN

15939008

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Hayreddin KIZIL

Diyarbakır 2017

T.C.
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

DI NAV ÇANDA KURDÎ DE ÇÎROKÊK SÎNDRELLA

Halil İÇEN
15939008

Danışman
Yrd. Doç. Dr. Hayreddin KIZIL

Diyarbakır 2017

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLERİ ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum **“DI NAV ÇANDA KURDÎ DE ÇÎROKEK SÎNDRELLA”** adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim sadece Dicle Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☐ Tezimin 3 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

13/01 /2017

Halil İÇEN

KABUL VE ONAY

Halil İÇEN tarafından hazırlanan **DI NAV ÇANDA KURDÎ DE ÇÎROKÊK SÎNDRELLA** adındaki çalışma, 13.01.2017 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Kürt Dili ve Kültürü Bilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

Yrd. Doç. Nesim SÖNMEZ

Yrd. Doç. Hacı ÖNEN

Yrd. Doç. Hayreddin KIZIL (Danışman)

ÖNSÖZ

Bu çalışmada birbirinden hem dini hem de kültürel olarak farklı olan iki toplumda ortak motifler içeren bir masal üzerinde durulmuştur. İsim ve öğeleri değişse de tema olarak aynı düşüncenin işlendiği Çêleka Zêrîn veya diğer adıyla Çîroka Sewîkê adlı masal ile Avrupa’da 200 yıl önce kayda geçirilmiş bir masal bu tezde karşılaşılmıştır. Tezde Çêleka Zêrîn veya diğer adıyla Çîroka Sewîkê adlı masalın Avrupa edebiyatında defalarca işlenen Sindrella masalı ile tema ve içerik bakımından benzer oldukları tespit edilmiştir.

Daha önce bu masal hakkında herhangi bir çalışma yapılmamış olduğu tarafımızdan tespit edilmiş ve tez konusu olarak tarafımızdan seçilmiştir. Burada kaydedilmiş varyant annem annem Şemse İçen’den aktarılmıştır. İlk önce sesli kayıt yapılmıştır. Ardından Reşad Sorgul’ün Mazıdağı ilçesinde yaşlı bir nineden dinleyip kendi sesiyle internet ortamında paylaştığı başka bir varyanttan da istifade edilmiştir. Masal orjinaline sadık kalarak yazıya geçirilmiştir.

Fransız ve Alman edebiyatlarında yani Germen kavimleri arasında da bilinen bu masal, Cindrella ve Cendrillion adlarıyla ele alınmıştır. Ayrıca Charles Peraut ile Grimm kardeşlerin eserleri de incelenmiş, Grimm kardeşlerin 1812 yılında yayımlanan orjinali Almanca olan bu eserin İngilizce nüshası Kürtçeye çevirilmiştir.

Tez üç bölümden oluşmuştur. İlk bölümde masal ile ilgili kısa tanım ve görüşlere yer verilmiştir. Daha sonra Avrupa edebiyatı ve Kürt edebiyatında hikâyeciliğin gelişimi

ve bu alanlarda yapılan alıřmalara yer verilmiřtir. Ardından Cindrella ile ilgili olan hikâyeler farklı özellikleriyle karşılařtırma yoluna gidilmiřtir.

Bu alıřmanın hazırlanmasında ve okunmasında desteęini eksik etmeyen deęerli danışman hocam Yrd. Do. Dr. Hayreddin Kızıl, deęerli sınıf arkadaşlarım ve kıymetli annem řemse İen'e katkılardan dolayı teřekkürü bir bor bilirim.

Halil İEN
Diyarbakır 2017

KURTE

Gelek teorî li ser derketina çîrokên hevşibîn li erdnigariyên cûrbecûr derketine. Ji van teroiyen yek jî belavbûna çîrokan ji navendekî ye. Li gorî vê teoriye ji ber sedemên şer, koçberî, bazirganî ev çîrok li dinyayê belav bûne. Dema belavbûnê de hin guherîn jî di çîrokan de çêbûne. Her wekî dema çîroka welatekî derbasî welatekî dinê be li gora çanda wî welatî diguhere, lê belê mijara çîrokan wek hev in û dişibin hev.

Çîrok xeyal û dinyaya zarokan dixemilîne û dewlemend dike. Dinyayek awarte xwe li hember zarokan vedike û wan dikşînin nava wê diyayê. Wejêya Ewropayê, lêkolîner ku bi sed salan di nav gel de gerîyan û gelek çîrok berhevkirine. Dûre ji bo wenda nebin ev çîrok xistin nava pirtûkan û nehiştin wenda bibin. Bi vî awî xweyî li çanda devkî derketin.

Li herêma Dîyarbekir û Merdînê bi navê “Çîroka Sêwîke an jî Çîroka Çêleka Zêrin” çîrokek heye. Di nav gel de bapîr û dapîran vê çîrokê di şevên direj ên zivistanê de ji nevîyen xwe re dibêjin. Ev çîrok û çîroka Cindrella dişibin hev. Du sed sal berê nuha Birayen Grimm pirtûka “Kinder und Hausmärchen” de çîroka Cindrella nivîsandine. Lê di nava Kurdan de berhevkirina çîrok û çanda devkî ew qas ne kevn e. Ji ber vê me xwest di vê tezê de em hem varyantek ji çîrokê je wendabûnê xelas kin hem jî şibandina wan nîşan bidin. Bi vî awayî em ê dewlemendiya çanda Kurdan jî derxînin pêşberî lêkolîneran. Em bawer dikin ku di çanda Kurdan de gelek çîrok hene. Heke ev çîrok bi çîrokên gelên din re werin berawirdkirin dê gelek temayên hevbeş derkevin.

Peyven Sereke

Grimm, Çêleka Zêrin, Sindrella, sêwîke, Aschenputtel

ÖZET

Masal; çocukların hayal dünyasını zenginleştiren ve onların yeni dünyalara yelken açmalarını sağlayan bir araçtır. Avrupa edebiyatında yüzyıllar içinde halk arasında anlatılan masalların zamanla sözlü gelenekten yazarlar vasıtasıyla yazıya geçirilmesi ve kitap olarak yayınlamaları, kaybolmaya yüz tutmuş hikâye ve masalların zamana direnerek kalıcı hale gelmesini sağlamıştır. Savaşlar ve göçler nedeniyle, ticaret yolları üzerinde bulunan coğrafyalar arasındaki bir ülkede bilinen bir masal, başka bir ülkede o ülkenin kültürel değerlerini de alarak yeniden şekillenir; fakat konu ve içerik bakımından yine de birbirinden izler taşıdığı görülür.

Grimm kardeşlerin “Kinder und Hausmärchen” adlı kitabında yer alan Cindrella masalı, Diyarbakır ve Mardin yöresinde yaşayan Kürtler arasında sözlü olarak yıllardan beri “Çîroka Sêwîke û Çîroka Çêleka Zêrin” adlarıyla bilinir. Halen nineler ve dedeler tarafından torunlarına uzun kış gecelerinde masal olarak anlatılmaktadır. Bu tespit sonrasında yapılan bu çalışmayla unutulmaya yüz tutmuş ve sözlü olarak devam eden bu hikâye yazılı bir hale getirilmiştir. Kürt edebiyatının da dünya edebiyatları içerisindeki yerinin ve zenginliğinin görülmesi ve hakettiği yeri alması için çalışmalar yapılması ve daha ileri seviyelere taşınması gerekir.

Anahtar Kelimeler

Grimm, Çêleka Zêrin, sêwîke, Cindrella, Aschenputtel

ABSTRACT

Story is a means that enrich the imagine of children and open a new world. Having been told for centuries in folk in european literature, by times passing from oral to written language thanks to writers and publishing as a book, this stories have been permanent by resisting times and about to losing. As a result of wars and immigrant, a story in a country which is on trade roads can be named with influced by culture and called with new name in another country. Although topics and contents still the same.

The story of Grimm brothers “Kinder und Hausmärchen” which is located in the Cindrella story book also explain between kurds whose living in Diyarbakır and Mardin area as Called “Çîroka sêwîke û Çîroka çêleka zêrin” since many years. It is still explained by grand mother and fathers to their grandchildren in long winter nights. After determination of this study we aimed to revealed and being writing with this study, which has been forgotten and has been continueing as oral explaining. We would like to give Kurdish literature 's take its rightful place and wealth in the world of literature and make a study for move to more advanced levels.

Key words

Grimm, Çêleka Zêrîn, sêwîke, Cindrella, Aschenputtel

NAVEROK

Sayfa No.

ÖNSÖZ	III
KURTE	V
ÖZET	VI
ABSTRACT	VII
NAVEROK	VIII
KURTEBÊJE	X
DESTPÊK	1
1. ARMANCA LÊKOLÎNÊ	2
2. GIRÎNGIYA LÊKOLÎNÊ.....	3
2.1. Modela Lêkolînê û Rêbaz	4
2.2. Mînakdan û Berhevkirina Agahî:	5
BEŞA YEKEM	6
DÎROKA ÇÎROKAN	6
1.1. PÊNASÎNA ÇÎROK/ÇÎRVANOK	6
1.2. ARMANCA ÇIROKAN	8
1.3. DI ÇÎROKAN DE RÊBAZA PROPP	10
1.4. DÎROKA ÇÎROKÊN EWROPA.....	15

1.5. DÎROKA ÇÎROKÊN KURDAN	19
BEŞA DUYEM	25
WERGERA ÇÎROKÊN SÎNDRELLA Û ÇÊLEKA ZÊRÎ AN SÊWÎKÊ.....	25
2.1. CÎNDRELLA (Aschenputtel) (Çîroken Grîmm 1812)	25
2.2. ÇÊLEKA ZÊRÎ-SÊWÎKÊ.....	32
BEŞA SÊYEM	37
BERAWERDKIRIN	37
3.1. BERAWERDKIRINA ÇÎROKA ÇÊLEKA ZÊRÎN-SÊWÎKÊ Û SÎNDRELLA- ASCHENPUTTEL.....	37
ENCAM.....	43
ÇAVKANÎ (KAYNAKÇA).....	45
PÊVEK 1:.....	49
1.Çîroka Sîndrella ya Îngilîzî	49
2.Çîroka Sîndrellayê û Wergera Wê ya Tirkî.....	58
PÊVEK 2:.....	66
Çîroka “Sîrmalı Papuç” a bi Tirkî.....	66

KURTEBÊJE

<i>amd.</i>	: Amadekar
<i>B.</i>	: Berg
<i>Bnr.</i>	: Binêre
<i>ç.</i>	: Çap
<i>çap.</i>	: Çapxane
<i>H.b.</i>	: Heman berhem
<i>H.c.</i>	: Heman cih
<i>H.g.</i>	: Heman gotar
<i>H.r.</i>	: Heman rûpel
<i>Hwd.</i>	: Her wekî din
<i>j.</i>	: Jimare
<i>nd.</i>	: Nivîskarên din
<i>r.</i>	: Rûpel
<i>vgz.</i>	: Veguhêz
<i>wer.</i>	: Wergêr
<i>weş.</i>	: Weşanxane

DESTPÊK

Dema ku min çîroka Çêleka Zêrî ji dîya xwe guhdarî kir, min got ev çîrok dişibe çîroka Cindrella'yê û min dest bi vê xebatê kir. Min xwest bi vê xebatê çîrokek ji çanda Kurdan a bi devkî ji wendabûnê xelas bibe û bi nivîsînê cihê xwe bigire dîsa di nava çanda Kurdan de. Dema mirov wek lêkolînerekî di nav gelê xwe de bigire û çî çîrok, çî pêkenok, çî gotinên pêşyan û hwd. berhev bike dê gelek keresteyan bibîne ji bo perwerdehiya zaroken Kurmancan. Ev jî hem bo dîtina dewlemendbûna çanda xwe hem perwerdehiya wan gelek girîng e. Divê bê gotin ku nêzî vê çîrokê çîrokek Kirdî/Zazakî jî heye bi navê Elik û Fatik.

Dema mirovek, lêkolînerek li ser çîrokan bixebite divê haya wî ji xebatên din jî hebe. Bi vî awî bizanibe di dinyayê de kê çî nivîsandiye. Ji bo vê jî divê mirov/lêkolîner berê nirxandina çanda Ewropayê lê bikole, min jî li jêrê xebata xwe li ser vê rêzê kiriye.

Çîrokên xeyali ji bo zarokan çî ji aliye afirandinê çî jî ji aliye xeyalan de dinyaya wan dixemilîne û dewlemend dike. Heke lêkolîner bi vê nêrînê li çîrokên Birayên Grimm jî binêre ew e gelek tiştan bibîne ku nuha li dinyayê li ser van çîrokan gelek filmên karton hatine çêkirin.

Birayên Grimm yekem car li ser çîrokên geleri bi metodik, lêkolîn kirine û ew tomar kirine. Sala 1812an de bi navê “Kinder- und Hausmärchen” pirtûkek ji bo zarokan çap dikin û diweşînin. Beriya Birayên Grimm jî xebat hebû lê ji bo lêkolîneran bê qîmet bû, lê Birayên Grimm li ser xebatên xwe lekolinêk serkeftî dikin û wan çîrokên geleri kite kit digerin û berhev dikin. Piştî wan di vê warê de xebat pêş de dêren. Ji bo

berhemên wan yanî çîrokan di zimanên dinyayê de gelek pey tîn bikaranîn. *Di zimanê Îngilizî de ji bo çîrok “tale”, Fransewî de “conte”, Tirkî de “masal”, Erebi de “mesel”, Elmanî de jî “machen” tê bi kar anîn. Di Kurdiya kurmancî de derhaqa cureya vê vegotinê de gelek peyv hene. Çîrok, çirçironik, dastan, xeberoşk, çêrçerok, çîronk, çîvanok, qewatî, be ser hat, meselok, xeberoşk, çîrvanok, çîrçîrok, serborî, metalok, kurteçîrok, xemisok, mesel, serpêhatî, hikaye hwd.* ” (Kızıl û Tanrikulu, 2015:2)

Li jêre piştî destpêke bi rêz li ser agahiyên çîrokan, li ser Brayên Grimm, li ser dîroka çîrokên Kurdan û rojavayîyan hatiye sekinandin. Di dawiyê de li ser danberhev kirina cûreyên çîroka Cindrella û Çîroka Sêwîke an Çîroka Çêleka Zêrin hatiye sekinandin. Dûre dawiya tezê de ji bo berawirdkirinê hin pêvek jî me lê zêde kir. Li wêneyên ji pirtûka Cindrella, çîrokeke bi Tirkî ya nêzîkê û çîrokek Zazakî jî danî.

1. ARMANCA LÊKOLÎNÊ

Di vê lêkolînê de armanc ew e ku çend versiyonên çîroka Cindrella û çîroka Çêleka Zêrin bidin berhev. Ji bo vê armancê li ser çend çîrok hatiye sekinandin û derheqê mijara çîrokê de agahî û zanyarî hatiye danîn.

Wêje di jiyana mirovan de cihekî gelek girîng digre. Carna mirov bêhnek û çend kêliyan be jî bixwaze ji nav teqûreqa serêşên jiyana rojane derkeve, bêhna xwe hinekî berde, wensa xwe bîne û demeke aram, bê stres derbas bike, biçe cîhaneke din, xwe bi nav xeyalan de berde. Di demên wiha de, wêje û edebiyat bi hewara mirov de tîn. Zanist zemanê xwe ji devê gerok û çîrokbêjan li destanên kevin, destanên qehremanî û evînan, li helbestên şaîran guhdarî dikiirin.

Tebeqe û komelên xelkê jî li meydana û li gasînan şano temaşe dikir, li ode û dîwanxaneyan li çîrokan, fabl û stranên cûbecûr guhdarî dikiirin. Li Ewropayê şaîrên sazband û hozan di nav şatoyan û xelkê de diçûn û dihatin, xelk diniwîsandin, gel

kêfxweş û dilşa dikirin. Bi qirdik û qerfvanan xelk dikenandin, ji west û betla karên giran dadiweşandin, dilên wan avreşandî dikirin.

Dengbêj, çîrokbêj, stranbêj û derwêş jî gund bi gund digeriyan berhemên xwe bi devkî ji wan re digotin, vedigotin. Derwêş li zozanan digeriyan berhemên dînî vedigotin. Dengbêj berhemên dunyewî dixwendin. Çîrokbêj ji zarokan ree carna ji mezinan re berhemên xwe vedigotin.

Îro jî em dibînin televizyon û sinema ketiye şûna wan. Li zivistanan, her şev şûna çanda devkî êdî berhemên hazir û paketkirî tê pêşiya bîneran. Şûna filmên bi efekt ketine şûna berhemên edebî. Em niha jî dibînin ku zarok, hin cihan ji alî ziman ve lawaz in. Ji ber ku çanda devkî ne tenê xeyalan dewlemend dike ziman jî hînî gel dike. Lê berhemên televizyonan mixabin ziman hînî wan nake.

2. GIRÎNGIYA LÊKOLÎNÊ

Merc û teşeya jiyana modern bi demê re giredayiye û her dem nîrxên çand û hûnera gel vedigûhere ku hetta li ser wan rîtuêlan, lêkolîn çênebe, tê jibîrkirin û wan çîrokên kevneşopî wenda dibin.

Di vê navberê de hin kevneşopîyan jî holê radike û wan dide jibîrkirin. Ji ber vê yekê girîngiya tomarkirina zargotin derdikeve pêş. Divê mirov bi saziyên heyî, rojekî pêş de bi awayekî zanistî dest bi berhevkirina zargotinan bike û rêbazên modern li gor teknîka demê, wê bide qeytkirin.

Mijarên wan ku nêzî hev in Çîroka rojava Cindrella û çîroka rojhilat “Çîroka Sêwîke û Çîroka Çêleka Zêrin” a ku hê jî li bajarên Amed û Mêrdînê di nav gel de tê gotin pêwîst e bê nasîn û bîr berawirdkirin.

Di vê berhemê de bi encama lêgerîna literatur, agahiyên têrikirin (kifayetli) çêbûye û bi dawiya lêkolînê tiştê ku bûne mijara pêwendiyê bi çawahanî (nitel) wekî encamên objektif çêbûye û hatiye ferz kirin

Di vê xebatê de çîroka Çêleka Zêrin gelo dişibê çîroka Cindrellayê? Çîrok an çîrvanok çi ye? Di nav çîroka Cindrella û “Çîroka Sêwîke û Çîroka Çêleka Zêrin” de tiştê cûdahî û wekhevî çi ne? Çîrok çima ji hev diqetin û cûda dibin? Ji bo bersiva van pirsan, pêwist e em dîrok, kultur û wêjeya xwe nas bikin.

Çîrvanok: Çîrvanok ew çîrok in ku cih didin leheng, bûyer û tiştên awarte û çîrokên di nav gel de ne ku bi salan, sedsalan bi devki di nav gel de tê gotin.

Çîrok: Li ser bûyer û demen di rastîn se qewimîne an li ser jiyana rastîn hatine xeyalkirin.

Çîrçîrok: Bûyerên ji xeyalên gel derketine û van bûyerana di jiyana rastîn de nayê dîtîn an bi tûmî an jî hinekî ji jiyana rastîn bi dût in. Gellek carî bi kesayetiyên nedîtî û bûyeren nedîtî neqîşkirî nin. Ev lêkolîn bi zêdeyî li ser çîroka Cindrellayê sekinîye û cûreya vê çîrokê ya di nav Kurdan u rojavayîyan de daye berhev û li ser agahdariyên van hatiye sinorkirin. Hatiye dîtîn ku li ser vê mijarê xebatên zêde tune û ev xebat li ser atlasa çîrokan dê wekî lêkolîn bikê û Çîroka Çêleka Zêrin jî din av de bê.

2.1. Modela Lêkolînê û Rêbaz

Ev mijar **lêkolînek şayesandin** e li ser berhev kirin û danberhev kirina çîroka Cindrella û Çîroka Sêwîkê yan Çîroka Çêleka Zêrin. Agahiyên ku ji çavkaniyan hatiye civandin û şîrove kirin wekî **çawahanî** hatiye nirxandin. Jê cûda **modela şekirin** hatiye bi kar anîn.

Vê modelê da du kêmasî heye: yekemîn peydekirina agahî, a duyemîn astengkirina kontrola agahî ye.

Dema mirov bixwaze li ser wêjeya neteweyekî lêkolînekê bike, berî her tiştî mirov serî li berhem û çavkaniyên devkî û nivîskî dide. Di vî alî de wêjeya kurdan ya devkî dewlemend e, kevin e, bi şax û per e, ji efsane û mîtolojiyên çendamarî, çendrengî, ji diyardeyên astrolojîk, kozmografîk, ji destanên mîna Gilgamêş, Mem û Zînê, Xecê û Siyamed, Zembîlfiroş û hwd. bixwedî dibe.

Edebiyata kurdî a nivîskî ya nûjen ji edebiyata kurdî ya klasîk sûd werdigire. Çîroknivîser dikarin ji ber destanên kurdî çîrokên baş û serketî biafirînin.

2.2. Mînakdan û Berhevkirina Agahî:


Di vê berhemê de ji sûdwergirtina lîteratura çîroka Cindrella û Çîroka Sêwîke an Çîroka Çêleka Zêrin hatîyê berhevkirin û danberhevkirin. Ji bo vê di serî de pirtûkên berhevkar û lêkolînerê çîrokan Brayên Grimm hatiye xwendin û bi devki li Şemse Îçen¹ û li ser malpera youtube li Reşad Sorgul² hatiye guhdarkirin.

Ji ber vê ji van pirtukan sûdwergirtin çêbûye: İlhan Başgöz-Masalın Anlatıcısı, Berivan Can-Modern Masalların Analizinde Propp Metodu, Nilgün Çıblak-Propp'un Masal Çözümleme Metodu, Grimm-Kinder-und Hausmärchen û Grimm Masalları, Umay Günay-Masal, Evrim Ölçer-Türkiye Masallarında Toplumsal Cinsiyet Ve Mekân İlişkisi...

Agahiyên ku ji çavkaniyan hatiye berhev kirin wekî çawahanî hatiye dahûrandin û çend cureyên Cindrella hatiye berhevkirin û danberhevkirin. Agahî û ramana teze di encamê de hatiye gotin.

¹ Şemse Îçen dayika min e(Halil Îçen). Bi devki gelek çîrokan dizane.

² Reşad Sorgul li ser malperê di youtubê de weşandiye. Reşad Sorgul wê çîrokê li Mêrdîn Çiyayê Mezî ji dapireki guhdar kiriye.



BEŞA YEKEM DÎROKA ÇÎROKAN

1.1. PÊNASÎNA ÇÎROK/ÇÎRVANOK

Çîrok an çîrçîrok; dem, cîh û lehengên wê nedîyar in, xwedî taybetîyên derasayî ye, hinek lehengên wê ji nav ajal in, hinek jî mirovê derasayî, cin, key, dêw in. (Can, 2008: 8). Çîrok bi sûd, exlaqî û perwerdeker e; ne neteweyî ye lê gerdûnî ye. Zêdeyî ji bo zarokan e. Di xeyalêb zarokan de cîhaneke nû vedîke.

Çîrvanok ew çîrok in ku cih didin leheng, bûyer û tiştên awarte. Gotina çîrvanokê berî her tiştî ji çîrvanokên wekî **Mîrze Mihemed**, **Şengê û Pengê** û **Bahlûl** ên devkî, ku gelerî ne tê. Lê berhemên ku tu têkiliya wan bi gelêriya devkî re tune bin jî hene ku wekî çîrvanok hatine nivîsîn. Ew jî ji ber taybetiya xwe di nav çîrvanokan de cih digirin. Çîrvanokên gelêrî dibe çar kom:

- Çîrvanokên ajalan
- Çîrvanokên awarte û rasteqîn
- Çîrvanokên qerfî
- Rêzeçîrvanok

Çîrvanokên ajalan bi gelemperî kin û kurt in. Çîrvanokên **La fontaine** jî mîna keke biyanî ji bo çîrvanokan e ku mirov dikare bîne zimên. Li dinyayê çîrvanokên La Fontaine wekî çîrvanokên herî xweş tên zanîn. Di kurdî de **Şengê û Pengê û Gur û Rovî** jî wekî bi sedan çîrvanokên ajalan li Kurdistanê hîn jî tên gotin.

Di çîrvanokên awarte de digel hebûnên asayî qala cîn, pêrî, hût (dêw), zîha û hwd tê kirin. Di çîrvanokên rasteqîn de jî bi piranî qala padîshahekî tê kirin, wezîr, qîza wezîr û qîza padîşah, kurikekî feqîr û jîr û hwd. tê kirin.

Çîrvanokên Qerfî jî li ser armanca kenînê hatine hûnandin. **Keçelok, Bahlûl** û hwd jî mînakên çîrvanokên qerfî ne.

Rêzeçîrvanok jî bi piranî li ser têkiliyeke mantiqî bi hev hatine girêdan, li ser bûyer û pêkhatinê hêsan didome.

Zeynelabidin Zinar³ Çiya Mazî di pirtûka “Baxek Ji Folklorê Kurdî” de de ji bo pênasina çîrokê wisa dibêjin: “Çîrok / Kurteçîrok / Hikayat, Vegotina bûyerek bi devkî an jî bi nivîskî re çîrok/kurteçîrok an jî hikayat tê gotin. Berhem bûyerên bi rastîn, nêzikî rastîyê, an jî mîtolojî bi kurtayî û bi islûbek xweş pêşkeşî xwendevanan an jî guhdaran dike. Çîrok bûyeran bi kurtayî, bi hunandinek hêsan, bi zimanek xweş tîne ziman. Di çîrokê de bal li ser bûyerekê an jî rewşekê ye. Bûyer an jî rewş li mirovekî re tê girêdan; an jî cîh û dema bûyer û rewşê bi şiklek heyecanî û mereqvanî tê vegotin.

³ **Zeynelabidin Zinar** nivîskar, wergêr û lêkolînerê kurd e, di 1953'an de li gundê Hedhedkê girêdayê bi qeza Qubînê ve hatiye dinyayê. Yazdeh sal medreseya kurdî, piştî Imam-Xetîb û lîse xwendiyê. Piştî kurtedemeke leşkeriyê, Zinar yazdeh sal li belediya Êlihê şixuliye.

Cîh û dema bûyer lê diqewime belû ye, di bûyerê de kê m kes hene û vegotin kin e. Di çîrokê de xisletên mirov, cîh û demê dirêj nayên teswîr kirin. Xwendevan bi hinek îşaretan bi xeyalên/nîgaşên xwe pêşî û dawîya çîrokê temam dike."⁴

1.2. ARMANCA ÇIROKAN

Öztürk di mijara xwe de dibêje ku; her gel; kevneşop, çand, raman, huner û kesayetê neteweyê xwe dixin nav çîrokên xwe. (Öztürk, 1986:102). Başgöz jî mîna Öztürk difikire û wisa dibêje; yê ku çîrokan dibêje çîrokê di nû de diafirîne û di her warê de neqş û rengên xwe dide çîrokê (Başgöz, 1988: 26). Günay jî dibêje ku di nav çîrokên dinê de pir hevparî hene û di alî neteweyî de ne wek hev in. (Günay, 1992: 321).

Çi kesê bixwaze ku zargotina xwe bi der û dora xwe bide naskirin, divê serê pêşî çîrokan bide hev. Hilberina herî mezin a folklorê jî çîrok e.(Meretowar, 14)

Çîrok hem devkî hem jî nivîskî di nav gel de bi sedsalan tê veguhastin. Ji bo vê çîrok ji bo gelan mîna nexşe ye. Di nav gel de çîrok çand û ramana gelan nîşan dide. Xeyalê mirovan fireh dike û ji bona perwerdehiya zarokan pir tişkî girîng e. Ji bona vê gelek hunermend, lêkolînêr, zanyar, siyasetmedar û rojnameger li ser çîrokan gelek xebatên girîng kirin e û çîrok ji bo exlaq û fezîlet wekî perwerdehiyek şahînê dîtine. Bi taybetî ji bo çekirina bingehîya çanda Ewropayê çîrok rolekê serekê girtiye. (Özünel, 2011: 60)

Ölçer wisa dibêje; çîrok tekîliya çand û wejê nîşan dide û berhemên devkî û kevneşopîyan gelan dide berçavan û diafirîne. (Ölçer, 2003: 5).

Çıblak jî dibêje ku mirov xeyal û hêviyên xwe û tiştên ku dixwaze bibe û çebike wekî derasayî di nav çîrokan de nîşan dide û bi alîkarîya çîrokan tîne ziman. (Çıblak, 2005: 2)

⁴ Çiya Mazî, 2014, "Baxek Ji Folklorê Kurdî" Weşanhaneya Berbang, İstanbul, s.353

Dorson di pirtûka xwe ya “Günümüz Folklor Kuramları”ê de li ser folklorê nûjen disekine û dibêje ku tekiliya folklorê û rihê niştîmanîyê bi hev re ye. Di alî tekilîya rihê niştîmanî û çîrokan de Birayen Grimm sekinîne û çîrokên Elmanî berhev kirine. Piştî wan gelek lekolîner di sed sala 20an de ser wê mijarê sekinîne û arşîveke mezin ava kirine. (Ölçer, 2003: 12)

Di çîrokan de cezayên bitirs hene, lê tolhildan tune ye. Nebaş ji aliyên lehengan ve hema hema hiç nayên cezakirin. Ê ku vê dikin nîgarên tihêlî ne an jî mirovên li derveyên jiyanê ne. (Lüthi, 17) Aschenputtel di çîrokên xwe de ew bi ceza dide wan, digel wan di van herdu çîrokan de wekhevî wîlqasî gelege ku em karin bejin ev herdu çîrok ji hev bandorman bûn. Çîrok koçberî, reyên bazirganiyê an jî ji ber herban ji welatekî diçin welateke dî. Di heman çîrok li welatên cuda ku diçe ev gerdûnîtiya wê nîşan dide. Mînak; Çîroka Aschenputtel ji bilî Çîroka Alman Grimmli her welatî heye. Hinek ji van ev in; Li Finlandiya Îtalya ve Îran’ e. Çîrokên Grimm û din ava Ewropa û li derveyê wê, ê wek wê anîn cem hevudu pirtuka Grimms Märchen International 7 çîrok di nav de heye. Di nav van de ê wek Turkiye behsnakiriyê.

Her welatî ev çîrok li gor çand, kevneşopên xwe çedikin û van çîrokan di mal ji xwe re. Ji ber vê yekê çîrok bi gelemperî hemû wek hevudu bin jî dibin çanda welatê xwe de mane. Lê belê ev guhertin sehan çîrokan xirnakê wateyeke dî dixwê navde. Lewra erka civaka welatê ku di nav de, neynika jiyana kevneşopîyê girtin ser xwe û bune nîrxên cuda û çanda cuda ji civakê re. Mînak; Her tiştên nebaş ku bi keçikan sêwî dikin piştî keçik wan dibexişene. Ev jî dîsa dide nîşan ku hemû çîrok hemû hudud derbas kirine xwe danine hijêkirin “Û hêzên vegotinê ku xiranebê, hududên heremî, navnetewî, çandî û olî derbaskirine.” (Tomkowiak; Marzolph, 1996: 9) Ev jî weha dide xuyakirin çîrok tenê ne xezîna çanda welatekiye ew berhemên gerdûnî û pirçandî û dîtina nîşana welateki ye.

1.3. DI ÇÎROKAN DE RÊBAZA PROPP

Vladimir Yakovlevîç Propp, kurê malbateke bi eslê xwe German e, 17 (29) di meha Nîsanê 1895 li St. Ew li St. Petersburg ji dayik bû. Di ciwanîya xwe de ku jîngehê û nişîvan Rûsyayê 1913-18 St. Ew li zanîngeha Petersburg dijiyan; Rûsya dixwend fîlolog û German. Di saziya perwerdeya navîn wê karîyera xwe wek mamoste ji bo hînkirina van ziman dest pê kir. Hingê ew ji mamoste German li kolejên bû; Ku di corpus Propp sê "Introduction German bo pirtûka xwendekarên Russian 'û gotarek li ser rêziman German ji vê salê de hiştin. Û di sala 1932 de wî ji dibistana li Zanîngeha Lêningradê û li wir ta mirina wî re man. Li vir, ew zimanê jî kursên di sala pêşî da, lê ew li ser folklorê piştî 1938 giraniya bû û tu caran ji bo linguistics an pêdagogiyê zimanê vegeriya. Serokê beşa ofîsa Folklore, bi hev re bi beşa sereke yê edebiyata Rûsî, heta ku derbas dibe; Ew di pêwendiyên xurt bi Akademiya Yekîtiya Sovyetê of Sciences bû.

Berhema wî, ku paşê dê Proppe cihanê karê herî berfireh naskirin bînin navûdengê e û niha, Morphology ji folktale (Tables Morphology) a sala 1928 e. The name of the book e bi rastî hinekî cuda ji eslê îro tê zanîn; Propp di pêşerojê de, "pirtûka Morphology ji Wondertal bo (Morphology ji Tales Awarte) ez ji we re name bide, lê belê wondertale pirtûka weşanxaneyê ji bo ku ji wan re balkêş zêdetir (tale awarte) folktale (çîrokeke folklorî) û guhertin û da her kesê ... rêkeftin pirtûka bi zagonên giştî yê çîrok ku ez bawer... Lê niyeta min bû, hemû cûre lêkolîn diversity û tevliheviya hemû tale folk de ne; Ez tenê kind of a xeyal, ez dinirxînin çîrokeke nedîtî ye ku nîşan dide cudahiyên balkêş, "ew ê binivîse. Çi pirtûka li kûderê çi bi Yekîtiya

Sovyetê jî audio zêdetir li derveyî welêt bîne. Rexneyeke Russian, 1929 bi cî gotara bi peyama "Ji ber ku ji rêbaza Propp ya pêşeroja bi heybet ez tu gumanek" temam kirina kehaneta, lê ev li gorî wê, sih salên dûr e û ne jî wê here, hema newestîne sî salên pêş me. nav English li sala 1958 dîkin û, ji vê jî zêdetir, antropolojiya tevnî, ku damezrênerê û bavê zanyarê navdar French 1960 di peyama Claude Levi-Strauss ya "ji rêzê û From - Vladimir Propp ya A Work Thoughts li ser" navê pêşkêşiyê / rexneya vê, dema ku pirtûka yekem û, bê guman Propp dergehan ji bo seranserê cîhanê de navdar vekir, ew nêzikî heftê Propp; Live deh salên dawî de ji jiyana xwe. Levi-Strauss, Fransa û bandorên din li Ewropayê li New World tên afirandin, gotarek ji xazî di folklorê ji Dundese Space Amerika ew di Journal of Folklore Amerîkî li sala 1962 nivîsî û pirtûka Morphology yê 1964 weşandin ji aliyê Tales North American Indian Ev çi bikim; û di encam de, zanîna Propp ya kûr ji folklorê Russian, bi hev re bi besteya wî ya analîza tevnî yê Atlantîkê ku îstifadeyê ji her du aliyan de, bi taybetî jî piştî sala 1970 bi navê Propp bûye de a klasîk. Îro, tenê çend kes ji aliyê xetabar çîrok ji karê xwe de, ji analîzên ji aliyê referans ji bo rêbaza Propp, dibe pirtûkek tenê rabû hetta mêrê xwe tije hatiye kirin; Lîsteya karên ko di morfolojiyê, e êdî tu rewşê de, dev ji bo bazirganiyê ku bi hêsanî em rawestînin di bin dikarin bibin.⁵

Vladimir Propp zanyarek gelek girîng e. Li ser ziman xebitiye û zimanzanîstê Rus u Elmanan e li Zanîngeha St. Petersburgê. Li ser çand û folklorê sekîniye û bi pirtûka xwe ya bi navê "Morphology of Folktale (1928)" di cîhanê de bûye zimanzanistek navdar. Li ser gelê binkîyê (yerli) Amerîkayê (Kızılderili) lekolîn kiriye. Propp wekî ku Strauss⁶ çawa li Ewropayê gelek navdar e. Di alî analîza çîrokan de Propp jî wisa li Emerîkayê gelek bi navê deng e. Berhemên Propp li ser şanasî, nijadnasî, folklor û binyatgerî de girîng e. (Çıblak, 2005:638)

⁵ <http://www.avestakitap.com/yazar.php?id=74> Dîrok: 27.12.2016

⁶ Strauss yekî gelek navdarên zimanzanîstê cîhanê ye. Pirtukê wî di aliye ziman, zimannasî de çavkaniyekî mezin e.

Propp di berhemên xwe de, li ser razber û şiklên çîrokan sekini yê. Lê bi zêdeyî li ser şiklên wan sekini yê. Propp di çîrokan de li çalakên neguhertî gerîyaye û gotîye ku lêhengên çîrokan diguherin lê çalakên wan naguherin. Yanê pirê çîrokan di alî rêbaz, derasayî, ziman, cih û dem û çalakî de dişibihin hev. Çalakên lehengan di ser zanîstê de girîng e. Yanê Propp çîrokan di alîyê fonksiyon u çalakîyen lehengan de lêkolîn kirîye (Propp, 1998: 74; Can, 2008:3). Ew çalak û fonksiyon di alî rêzê de jî wekî hev in. Ji bona vê jî çîrokên nezî hevdû re “heman tîp” gotiye. Bi kurtasî Propp hemû çîrokên derasayî mîna hev dibîne û di analîza xwe de 31 fonksîyonên lêhengan, wate û sembola wan nişan dayê. (Çıblak, 2005:638)

1. Yek malbat ji malê dûr dikeve. (Pênas: dûr, nişan β)
2. Leheng yek qedexekirin pêşwazîkirin. (Pênas: qedexekirin, nişan γ)
3. Qedexekirina gerisandin. (Pênas: qedexe, nişan δ)
4. Di êrîşkar hewl dide ji bo bidestxistina agahiyên. (Pênas: lêpîrsînê de, nişan ε)
5. Di êrîşkar de agahiyên li ser mexdûran re dicivin. (Pênas: Berhevkirina agahiyên, simbola ζ)
6. Êrîşkarek bi neheqî li ser dehî wî bi dewlemendiya bigirin,. (Pênas: xapandinê, nişan η)
7. Berxeter xapandin, û dê ji neçarî dijmin alîkarî kirine. (Pênas: beşdariyê di sûc, nişan θ)
8. Êrîşkarek ziyan dide ji malbata de. (Pênas: xerab ji bo nişan A)
9. Evil an de belav nûçeyên li ser kêmasiyên; Behsa leheng, leheng hatiye şandin, an jî diçe. (Pênas: Sedr, niha derbasbûnê, nişan B)

10. Hevbîr in ku vê çalakiyê de digerrîn leheng an jî ji bo çalakiya Ev biryar. (Pênas: di destpêka a beramber çalakiyê de, nîşan C)

11. Leheng ku ji malê veqetiyar. (Pênas: çûyîn, nîşan ↑)

12. Leheng a ceribandî ku destûrê dide te ku alîkariya bireser efsûnî yan jî pirsîyarî da ku êrîş e. Rû bi rû. (Pênas: bexşanden ku erk pêşîn a , nîşan D)

13. Bersiva leheng ji bo çalakiyên paşerojê de mirov bexş bike, dê wî nîşan dide. (Pênas: berteka yên leheng, nîşan E)

14 Bireser a efsûnî dane leheng. (Pênas: wergirtina a bireser bi efsûn, nîşan F)

15. Leheng ji bo cihê bireser venêrin gihandin. Ew ku anîne an jî birin. (Pênas: di rêwîtiya di navbera her du keyanî, rêberê rêwîtiya bi rêbarî re nîşan G)

16. Leheng û rûbirû êrîşkar hev û din de di pevçûneke. (Pênas: şer, nîşan H)

17. Nîşaneke taybet yê Leheng e. (Pênas: nîşaneke taybetî jî, ku nîşan I)

18. Têk çûn a êrîşkar e. (Pênas: serkeftinê, nîşan J)

19. Nebûna destpêkê yê xerabiyê yê rakirin an jî kêmasî pêşwazîkirin. (Pênas: rakirina, nîşan K)

20. Vegere leheng. (Pênas: vegere ↓ nîşan de)

21. Leheng tê çawdêrî kirinê. (Pênas: şopandinê, nîşan PR)

22. Mercê ku alîkariya leheng. (Pênas: alîkariyê, nîşan R)

23. Veşartin, nasnameya yê leheng, welatê xwe bi xwe an jî li welatekî din li wir e. (Pênas: nasnameya xwe veşartine, nîşan O)

24. leheng e sexte argûmanên bêbingeh diyar. (Pênas: bêbingeh Îfadeya, nîşan L)

25. Leheng ji bo bazirganiyê hêza tê pêşniyarkirin. (Pênas: kar hêza, ku nîşan M)

26. Kar mîaserkirina hêz. (Pênas: ji bo bi cih kar hêza, ku nîşan N)

27. Leheng tê zanîn. (Pênas: nîşan (n) , nîşan Q)

28. Lehengên finfinok, êrîşkar an eşkere ya nasnameya netewî ya belengaz. (Pênas: elicitation, nîşan Ex)

29. Leheng bergeh destkeftî kî nû ye. (Pênas: guhertina format, nîşan T)

30. Lehengên finfinok an êrîşkar, bèn cezakirin. (Pênas: ceza, sembola U)

31. Leheng zewicî û derdikeve ser text. (Pênas: zewacê, sembola W)

7 qadên çalakiyê de ji van erkên ku cih ji van erkên ji aliyê Propp 7 qelafet / aferînek heye.

1. . Êrîşkar (mirovên xerab)

2. Bexşende (peydeker)

3. Pîgar

4. Mîr û bavê wî (Kesekî xwest)

5. Hinêryar (hatin wezîfedarkirin)

6. Leheng

7. Lehengên finfinok (Dündar, 2002: s. 116)

Di we xebatê de li jerê jî li ser rêbaza Propp hatiye sekinandin. Çîroka Ewropayê Cindrella û çîroka Kurdan a Çeleka Zêrîn li ser rêbaza Propp hatiye sekinandin.

1.4. DÎROKA ÇÎROKÊN EWROPA

Çîrok di dîrokê de ba yewnanan mîna çîrokên li ser heywanan (fabl), li rojhilat mîna çîrokên hezar û yek şevî⁷ hatine gotin û nivisandin. Di şiklê nûjen de xebat û nivîsinên li ser çîrokan di sedsala 19an de li Ewrûpayê di dema romantîzmê dest pê kiriye. Çîrokvanên Îrisî Gogol, Dostoyevski, Turgenyev û Çehov ji bona pêşketina çîrokê û cîhgirtina wî ya di edebîyatê de xweyî roleke girîng in.”

Bi navê Jacob carl Grimm(1785-1883) û Wilhelm Carl Grimm (1786-1859) ji bilî welatê xwe Elmanyayê di welatên Ewropayê yên cûrbecur de, li ser Edebiyata devkî ya gelerî lekolin kirin û ji 200 î zêdetir çavkanîyên devkî yên çîrokan nivîsand û çap kirin. Ev çîrokan ji 70 zimanî zêdetir hatin wergerandin û li cîhanê belav bûn. Bi vî rengî; keda her dû biran nehiştin ku gelek çîrok werin jîbîrkirin. Xwendina van çîrokan bi hevî, tehlîtî, kefxweşî, xeyal, tirsên mirovan gelek keyfxweşîyeke mezin e.(Grimm, 2008:6)

Hûn zanin Kûlkedisi (la Cenerenotola) navê keçikeke ciwan e. Çîroka herî kevnar ya Kûlkedisi çîroka Çînê ya sedsala 9ye. Di edebiyata Ewropayê de yê ku kûlkedisi nivisandiye herî navdar di pirtukên derheqê Cindrellayê de Birayên Grimm û Cendrillon in.

⁷ (1001 Gece Masalları)

Ji vanan Birayên Grimm, Jacob Grimm û Birayên Wilhelm Grimm⁸ gelek navdarên nivîskarên çîrokên Elmanî nin. Îro çîrokên Birayên Grimm li her aliyê cîhanê tê naskirin û ji aliyê her kesi ve tên xwendin.

Berî neha bi 200 salî Çîrokên Grimm li Almanyaya hat çapkirin û piştî zimanê cuda ve hatin wergerandin. Jacob û Birayên Wilhelm Grimm li bajarê Kasselê li Almanyayê dijiyan. Wêneyên Elmanî û dadgehî standin. Dema ku wan ev çîrok nivîsand cîhanê cuda bû.⁹

Birayên Grimm, çîrokêy kevn yê bi Elmanî, efsane û helbest dane hev du û li gorî usluba nû bi navê ‘Zarok û Helîna Çîrokan’ (Kinder und Hausmärchen) dan weşandin.

Birayên Grimm 150 çîrok di navbera salên 1812-14 de nivîsandibûn. Niha hinek ji wan kevn bûne lê wek Kîrmızı Başlıklı Kız, Kül Kedisi, Hansel û Gretel, Pamuk Prenses nemir ma ne. Ev bûne mijar ji bo gelek film û romanên re. Li cîhanê bêjimar hat neqşandin. bi tenê li Ewropayê 550 cureyên wê tê gotin. Çîrok di navbera jinbav, keçhilîkekê de ye. Jinbav jê hez nake, te’deyan lê dike, jê dihesie jî. Lê perîkekî ku alîkariye wê dike û mirzayêki spehî ku pê re bizewice derbas dibe û bi jiyana Sindrellayê xilas dike.¹⁰

⁸ **Brayên Grimm** di sedsala 19an de li Elmanî dijîn. Navên wan Jacob û Wilhelm e. Evan her du bra xebatkarên navdarên li ser çîrok û çîrvanokan. Evana li Elmanî gund bi gund, bajar bi bajar digerin; di nav civak û mijûlî de dimînin û çîrok, çîrvanok, helbest û dastanê devkî berhev dikin. Navê berhema xwe ya yekemîn Kinder und Hausmärchen(Çîrvanokên Zarok û Hêlîn) datînin. Berhemên Brayên Grimm di aliyê zimanê Elmanî de gelek giring e.

Çend Berhemên Wan:

Keçmîra Pembû û Heft Boçî, Mala li Daristanê, Rapunzel, Hansel û Gretel, Bandovanê Bremen, Zarokê Pêçîk, Bedewa Razayî, Qîza Biserpûşa Sor, Sindrella.

⁹ Ramazan Pertev. (2015) Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Weşanxaneya Awesta Îstanbul. r.30

¹⁰ Alan Dundes,. (2007). "Fakelore Fabrikasyonu", Folklorun Sahtesi: Fakelore, Geleneksel Yayınlar, Ankara. r.76

Dê û bavê ne ku biyolojîk bin li zarokan nebaş dimeyzênin, heta te'deyan li wan dikan. Ev mijar bi sed salan e pişt bi pişt di gelek çîrokan de tê vegotin. Jinbav her daîm zarokên ku bi xwe re tînin her daîm ew zarok nebaş tînin nasîn. Mînak, di çîroka Kûlkediside, Sindrella ji destê wan tiştê nema ku wê nekişand, Di çîroka Pamuk Prensê de, jinbav bi keçilîta xweşik re her daîm di nav berberberiyê de ye, Di çîroka Hansel û Gretel de; jinbav dixwaze ji keçilîte xwe xilas bibe. Bi şêk ev çîrok mêtîyê civakê derdixe hole. Mirov kare bejê hinek rastî di nav de heye. Lê dê û bavê ku li keçilîteyê xwe baş dinerin jî ne hindik in.¹¹

Ev di derbariya xeletî û rastiya çîrokan e. Divê mirov waneyan jê bistîne. Xapandin û narast tînin cezakirin. Rast û jîr tînin muqafatkirin. Peyvên ku tînin gotin divê mirov bigire. divê mirov hey jî biyanîyan hebe.

Lê belê dîlkêşiyên van çîrokan jî van waneyan bêtir, demên şidandî û senaryoyên xwînî di bin de razaye. Profesora Tatar¹² vê rewşê weha tîne ziman: 'Tiştên herî nebaş ku mirov xeyal bike ku were serê mirov wê çî bibe? senaryoyên wek vana çedikin; Lê vana îfadeya 'wextekî' dibîne demeke dûr ku mirov jê emîn bibe. Navên çîrokan her nebaşiyê lê dawîya wan her bi kefxweşiyê xilas dibe.

Cihê ku Birayên Grimm lê dijîn, Kasselê, di nav baxçeyên botanîk de hin çîrok tînin zindîkirin. Jê pê ve pêşangeha di derbarê mirovan de fikirandin. Mînak; çîroka Keçîka Kumsor di reklama behnxweşikê de hat çêkirin. Ev vîdeo jî bo ku mirov were terbiyekirin. Wek peyvên nebaş ku li ser diwar were nivîsandin. www.bbc.com.masallar)

Kuratorên¹³ pêşangehê Louisa Dench, ji zarokan re vê peyamê dide: Her daîm mirovên baş bi ser dikevin.

¹¹ Mustafa Ruhi Şirin, (1998). 99 Soruda Çocuk Edebiyatı, Çocuk Vakfı Yayınları, İstanbul. r.121

¹² folklore German û profesora mîtolojiya Maria Tatar

¹³ Îngilizcedeki "creator" sözcüğünden gelmektedir. Yönetici, işi üstlenen anlamına gelir.

Li gor Dench, kartêkerên yekem ku ev çîrok heta roja me hat ev e; Gelek tişt mirov ber daye li gora xeyalê mirov. ‘Ku yek çîrokên ji we re bixwînê hûn dikarin di serê xwe de wek ku hûn dixwazin wê zindî bikin. Sêhra mezin di vir de ye.

Ev, sehrek e mezin dibe û dibe van çîrokan ji hêrsên dê û bavan tê parastin û di nav hinek çîrokan de temayeke hewldanî hebe jî, bi giştî ew zanin ku ev fentezî ne.

Wêjeya rojavayê de wêjeya zarokan bi lorî û çîrokên ji hêla mezinan de hatiye avakirin. Di demên berê de pirtûkê zarokan tunebû, çîrokvan, di nav çîrokên xwe de çanda gel û adetên wan jî diparezê û parastina çanda gel jî bi sedsalan xêra çîrokan di nav gel de dom kiriye. Çîrokvan çîrokên xwe ji bo mezina digotin lêbelê zarok jî çîrokên gora xwe guhdar dikirin û dipejirandin. Hozanên gel wan çîrokan berhev kirin û wan çîrokan di nav gelên din de belav kirin. Dasîtan, balat û çîrokên gel wusa çêbûye û belav bûye. Sedsalan 15de Çapxana Îngiliza de Caxton ji bo zarokan çîrokên biçûk nivîsandine. Gelê zadegan¹⁴ jî “Horn Book” pirtûkên lewhên sifir dixwendin û pirtûken xwe di nav qîloçan de di veşartin.

Li Fransayê, Charles Perault, di serdema 14. Luî de, wek bavê pirtûkên zarokan dihat zanîn. Perault sala 1697de di nav gel de geriya û bi çîrokên gelerî berhev kirin. Çîrokên navê pirtûkên wî; LaBelle au bois dormant (Xweşika raketî), Le Petit Chaperon rouge (Keçika kumsor), Le Chat botté (Pisîka bi gîzme), Cendrillon (Pisîka xwelî). Bi xêra van pirtûkan zorokên Fransiz ji çanda xwe xwendin. (Emmez, 2008:37)

Wan pirtûkan berê li Îngiltereyê dawiyê jî li Almanyayê hatine çapkirin. Li Îngiltereyê Jonh Newbery wan pirtûka bi Îngilizî sala di 1727an de bi navê “ Tales Of Matter Goose” weşand. Pişt re li Îngiltere û li Fransayê ji bo zarokan gelek pirtûk hatin nivîsandin. (www.estanbul.com)

¹⁴ Soylu, asil

Piştire pirtûka bi berg kirin û van pirtûkan di çapxanayê de zede kirin. Zarokan Robinson Crusoe a Daniel Defoe¹⁵ û Lemuel Gulliver a Jonathan Swift xwend û dinyayek xiyalî ji xwe re çêkir. Sala 1744an de John Newbery “Little pretty pocket book” (pirtûka şerîn a berîkê) weşand. (www.estanbul.com)

Wêjeya zarokan û çîrokên gelêrî yên di bi devkî hatîye berhevkirin. Joseph Jacobs çîrokên Îngilizî berhev kirin û bi vî awayî ew parastin. Birayên Grimm jî çîrokên Almanî berhevkirin û ew di pirtûka xwe de ew weşandin. (Emmez, 2008:12)

Di wêjeyên zimanên Awropî de, girîntirîn çalakiyên wêjeyî yên pêşîn veguheztina berhemên devkî yên ser nivîsê bûn. Bi vî awayî, wêjeya modern ku bingeheên wê çar sed sal berê hatine danîn, xwe dispêre ser çalakiyeke weha ku bi awayekî prîmîtîf di sedsala yanzdehan de dest pê kiribû, lê belê, piştî îcada çapxaneyê ya sedsala 15'an, li seranserê Ewropayê belav bû û bû yek ji cudahî û taybetmendiyên arîstokrasiyê. Em dibêjin "arîstokrasi" an jî "elîta civakî-wêjeyî", lewre wêjeya nivîskî di destpêkê de karê arîstokrasiyê bû. Ji ber wê ye ku heta ku sedsala 19an ku asta xwendinê hêdî hêdî li nava civakê belav bû û wêje ji hegemonyaya arîstokratan derket, li Ewropayê nivîskar bi pirranî beg û paşa û keşîş bûn, ku ji xwe desthilatdar bûn. (Emmez, 2008:12)

1.5. DÎROKA ÇÎROKÊN KURDAN

Di edebiyata Kurdî de, bi giranî palvedana girîng a li ser kevneşopa edebiyata devkî realiteya dîrokî û civaknasî ye. Erdnîgariya çîyayî, jiyana koçerî, têkilîya feodal li ser edebiyata Kurdî de, bi berfirehî, cih amade kiriye. Ji aliyên dîn ve, vê zordestiya li ser zimanê Kurdî, nebikaranîna perwerdehiya li ser Edebiyata Kurdî a devkî û hwd bi neyînî bandor li edebiyata Kurdî tê kirin. Edebiyata Kurdî a devkî çîrok, çîrçîrok, gotinên pêşîyan, mamik, efsane, û destan di xwe de hêwirandine. Çavkaniyên bingeheên

¹⁵ Ev berhem bi eslê xwe romane.

ên edebiyata Kurdî ya devkî; evîn, şer, jiyana rojane, tekiliyên di nav eşîretan de, koçberî, lehengî, pêşdarkirinên jiyana xwerû û devlemendiya mîtolojiyê ya Mezopotamyayê ye. Ji ber vê yekê; lehêng û motîfên çîrokan ev in: mêrxasên ku şer bi dêwan re dikin, xwortên çeleng, qerçil û tirsonek, evîndar, keçên xweşik, ajalên hov, mirovên mereqên wan li ser nêçirê heye, mîrên baş an jî nebaş, dostanî û bêbextî û hwd. (Çakar vd. 2010: 40-41)

Di dirêjîya dîrokê de, çi mirov çi civak, nedikarîbûn bêyî nûçe û dengûbasan jiyana xwe berdewam bikin. Ji demeke kevin de, çaxê mirovek dibû rêwî, û bi ser rêçikên çol û çîyan diket, diviyabû riya xwe ya ku di wê diçe, baş nasbike, û pêwîst bû jî ku, ji rêwî û gerokên rê û rêçikan, li rewşa riya xwe baş bipirse, da ku zanibe bê ka çi xeternak li ser riya wî heye, û wan rêwiyan bi çavê xwe, li wan der û navçeyan çi bihîztine û çi dîtine çi nedîtine?

Ji demeke dûr û dirêj de, ango berya mirov têkeve pêvajoya nivîsandinê, ku di sala (3500)î de, berya zayînê pêk hatibû nûçe di sînga mirovan de ango bi jiberkirinê dihatin parastin, û bi riya dev û zimanan, dihatin weşandin û belavkirin. Lê guheztina nûçeyan bi vî rengê devkî, di riya ode û tenûran de, li welatê kurdistanê ta demeke pir nêzîk pêkdihat, û dibêjim: Li hin deveran jî hê berdewam dike. Ji ber ku mîletê kurd ji şêx û melan pê ve, bi temametî bê xwendin û nivîsandin bû, xelkê nizanîbûn bi riya nivîsandinê nûçe belav bikirina, weha di tarîbûna ragihandineke reşî dirêj de dijîn.

Li gorî lêkolîna nivîskar Rênas Jiyan, Kurdan beriya tirk, ereb û farisan çîrok bi awayekî sistematîk nivîsandine. Melayê Bazîdî destpêka çîroknûsiya Rojhilata Navîn e. Li gorî çavkaniyên heyî yekem pirtûka çîrokan a sistematîk “Decameron”a Boccaio’yê îtalî ye.¹⁶ (Rênas Jiyan. www.xebat.com)

¹⁶ Boccaio di navbera salên 1313 û 1375’an de jiyaye.

Mele Mehmûdê Bazîdî wî kitêbeke bi navê Adetên kurdan nivîsandiye û pirtûka Şerefxanê Bedlîsî ya Şerefname ji wergerandiye zimanê kurmancî. Mele Mehmûdê Bazîdî¹⁷ herweha gelek çîrokên gelêrî jî nivîsandine. Zimanê Erebî, Farisî û Osmanî fêr dibe. Piştî qedandina dersan ku îcazê werdigire, carekî din vedigere Bazîdê cîhê ku lê ji dayîk bûyî. Li Bazîdê ji aliyekî ve dersê dide feqîyan, ji aliyê din ve jî li ser wêje û rêzimana Kurdî dixebite.

Mele Mehmûdê Bazîdî, ji bo ku gelê xwe baş nas bike, li gelek deverên Kurdistanê digere. Li erdnîgariya welatê xwe lêkolînan dike. Li nava gel, eşîr û koçeran dahûrînên baş dike. Rewş û timtêla gel baş hîn dibe. Mêvanî, malevanî, keçxwestin, dawet û dezgîran û cîrantiyê, hîn dibe û baş dişopîne. Van kevneşopîyan dinivîse û berhema wî ya bi navê Adab û Risûma Kurdan derdikeve holê.

Giraniya xebata xwe bi kurdî, bi zaravayê kurmancî dinivîse. Di heman demê de helbestan jî ji Erebî, Farisî û Osmanî werdigerîne Kurmancî. Dîroka Kurdistanê ya piştî Şerefnameyê, heta dema jîna xwe bi awayek rêkûpêk dinivîse. Li ser wêjeya kurdî radiweste û beşekê jê dinivîse. Li ser rêzimana kurdî jî radiweste û bi gelek qaîdeyan dinivîse. Ji berhemên Mele Mehmûdê Bazîdî ya ku ketî destê me, berhema bi navê Adab û Risûma Kurdan e. Adab û Risûm tê wateya orf û edet. Ev berhem bi zaravayê kurmancî hatiye nivîsandin. Orf, edet û kevneşopîyan Kurdan, di vê berhemê de bi awayek balkêş li ber çavan rahêxistine. Li gor agahiyan, ev pirtûka wî li zimanên Rûsî, Tirkî, Farisî, Erebî û zaravayê Soranî hatiye wergerandin.

.Balyozê¹⁸ rûs Aleksander Jaba¹⁹, di nîvê sedsala 19an de, weke balyozê Rûsistanê tê Erziromê. Aleksander Jaba, hê ji berê de bi awayek mezin meyla xwe dibû,

¹⁷ Mele Mehmûdê Bazîdî (1797 Agirî, Bazîd – 1863 Erzirom) alim, dîrokzan û nivîskarekî kurd bû. Mele Mehmûdê Bazîdî yek ji wan filozofên ku di sedsala hejdehan de dest bi nivîsandina neşra kurdî kiriye.

¹⁸ Balyozê, ku berê serekê-kebîr de dîplomatekî ku, nûnerên payebilind yên dewleta ji dewletên din e.

Balyozên, rayedarên li welatên ku ew lê dijîn, temsîl welatîyên serokê ku welatî

¹⁹ Erziroma ku ji peyrewên Russian 1848 bo 1866, ew weke konsulê re xizmet kir.

çand, wêje û dîroka Kurd. Li Erziromê ev keys dikeve destê wî ku hê bêtir lêbikole û ji nêzik ve bibîne. Herwiha bi Mele Mehmûdê Bazîdî re peywendîyan datîne. Hêdî hêdî hevûdin nas dikin û êdî xebatên wan bi hev re dest pê dikin. Xebatan li ser dîrok, çand, wêje û rêzimana Kurdî pêktînin. Mele Mehmûdê Bazîdî, ji pirtûkxaneyê xwe gelek pirtûkan dide Aleksander Jaba. Di nav van pirtûkan de gelek ji wan destxetên Mele Mehmûd in. Yek ji van pirtûkên ku dayî Aleksander Jaba jî, Adab û Risûma Kurdan bû.

Herwiha destnivîsên Mele Mehmûdê Bazîdî keti bûn destê Aleksander Jaba yê Rûsî. Dema ku Aleksander Jaba vedigere welatê xwe Rûsistanê, van destnivîsên Mele Mehmûdê Bazîdî jî bi xwe re dibe. Aleksander Jaba van destnivîsên Mele Mehmûdê Bazîdî di arşîva Petersburgê de bi cîh dike. Ji wê rojê û bi şûn de ji vê arşîva Mele Mehmûd Bazîdî gelek sûd hatiye wergirtin.

Berhemên Wî

- Adetên Kurdan
- Kîtaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan

Ev kitêb ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî bi xwe ve hatiye nivîsandin. Lê mixabin ew wenda ye. Heta niha ji bo peydakirina wê gelek hewil hatine dayîn, lê ew bêtir netîce mane. Li gor ew agahdariyên ji aliyê A. Jaba ve hatine dayîn, ew pêşgotina ku ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve ji kitêbê re hatiye nivîsandin û A. Jaba ew wergerandiye fransîzî û heta niha hatiye parastin û gelek kesên din ku di derbarê vê kitêbê de nivîsandine, em bi hindikî jî be di saya van de, di derbarê vê berhemê de dibin xwediyê zanyariyekê. (DOST . 2010: 15-17-102)

Em dikarin versiyonên vê çîroka êvîna Memî û Zînê li gorî qeydên demên wan yên cuda nas bikin. Di sedsala XVIIan de Ehmedê Xanî, di sedsala XIXan de Mele Mehmûdê Bayezîdî û di sedsala XXan de Roger Lescot hewl dane ku vê çîrokê derbasî nivîsê bikin û herikê bi formeke cuda nivîsandiye. Bayezîdî di eniya sosyolojîk, arşîv û

wergerê de jî pêşengek e. Ew li Kurdistanê geriyaye, adet û teqalîdên Kurdan berhev kirine, not kirine û piştî kirine berhem. Ji vê awirê mirovekî angaje ye, xwediyê çavdêriyên xwurt e. Ji awira çîrokên gelêrî de jî ew di nav pêşengan de ye. Hejmara çîrokên dane Aleksander Jaba ku salên dawî hatine weşandin. Îhtimal heye ku her yekî ji wan tiştek li gorî xwe lê zêde jî kiribe, tiştek guherîbe, an jî tiştek jê avêtibe. Weke ku Qanatê Kurdo bi xwe jî li ser 8 versiyonên Mem û Zînê sekinîyê, heger em bi tenê wan her heşt versiyonan bidin ber hev, em ê bibînin ku ne bi tenê di şikl û forma xwe de, lê her weha di bûyerên çîrokê de jî û di taybetmendiyên lehengan de jî guherînên balkêş dê ber bi çavên me ve bikevin. Lê dîsa jî xetta sereke ya navenda çîrokê her weke xwe dimîne: kurikek ji keçikekê hez dike, keç xwişka mîrî ye, lê ji ber ku fesadî dikeve nava çîroka wan, kur ji aliyê mîrî ve tê cezakirin û berxwedana kurik jî dibe sedem ku ew çîrok bigihîje heta îroj. Lê ev çîrok, li gelek deveran û bi nuansên cuda ve tê gotin, digel ku navê lehengan weke xwe dimîne. Hingê, em dizanin ku berhemeke giştî li gorî deman, li gorî cîhan û li gorî kesan dikare were guhertin.

Cudahiyêke din ya di nava Rojava û Rojhilatê de ew bû ku derfetên çapkirin û belavkirinê jî dereng gihîştin Rojhilatê û gava ku mirov hesabê peywendiya bi desthilatdariyê re jî bike, mirov nikare bifikire ku bandora edîbên rojhilatî li civakê bûye. Berhemên destnivîsê û yên çapkirî nikarin di warê pêşketina wêjeyî û civakî de mîna hevdu werin nirxandin. Li Rojhilatê, ji bilî dîwanên axa û paşa û began, li medrese û xwendîgehên din gellek kesên ku perwerdehiyêke giştî didîtin jî wêje nas dikir û berhem diafirandin. Lê belê, kêma berhemên wê "dewra nezaniyê" li nava civatê belav bûne û pirr kêma berhem ji yên belavbûyî jî heta îroj hatine parastin. Nimûneya herî baş ya vê çalakiyê jî dîsa Mem û Zîna Ehmedê Xanî ye. (www.kurdigeh.com)

Melayê Bazîdî jî (1797-1867) wekî Poe û Maupassant'î çîroknivîs û însanekî sedsala XIXem e. Sedsala XIXem sedsala çîrokê ye, di vê sedsalê de çîrok şîn û geş dibe û nasname û karakterek ji xwe re peyda dike. Di dawiya heman sedsalê de Rojhilata Navîn jî di bin bandora Rojavayê/Ewropayê de lewnê çîrokê nas dike; lê ji Melayê

Bazîdî û ji Kurdan derengtîr; ji ber ku di nav ereban de çîroknivîsê yekem Muhammed Teymûr'ê Misrî (1894-1973) û çîroka wî ya bi navê “Fî'l-Kîtar” e, çapa vê çîrokê 1915 e, lê çapa “Çîl Çîrokên” Mela Mehmûdê Bazîdî 1860 e. (Rênas Jiyan.www.xebat.com)

Derbarê folklora kurdî de windabûn û jîbîrkirin du endîşeyên esasî bûn ku roja me de jî ev xem berdewam e. Ji bo folklora Kurdî xetereya herî mezin kêmbûna lekolinên zanistîye.²⁰



²⁰ Pertev, age., Ramazan Pertev. (2015) Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Weşanxaneyê Awesta Îstanbul. r.14

BEŞA DUYEM

WERGERA ÇÎROKÊN SÎNDRELLA Û ÇÊLEKA ZÊRÎ AN SÊWÎKÊ

2.1. CÎNDRELLA (Aschenputtel) (Çîroken Grîmm 1812)

Jacob Ludwig Grimm û Wilhelm Grîmm Carl

Berhevokên wan Îngilizkî de bi gelemperî Çîrokên Grîmm, zimanzanistên Elman, Jacob (1785-1863) ve Wilhelm (1786-1859) ‘ın “Kinder-und Hausmarchen,” afirandekî bêdawî ye. Birayen Grimm, çîrokên gel ji gundiyan bihîstine û lêanîna çîrokên xwe jî wusa çêkirine. Cîndrella (1812) , demariya kîret û zirbirayên wê rehetî nedanin jê re le ew bi mîrzayek re zewiciye, çîrokek wusa ye.

Cindrella (Aschenputtel)

Di demekê de mêrikek û jina wî nexweş hebû û jina wî nezîkî mirina xwe, ba qîza xwe ya yekane kir û ber nivînên xwe jê re wiha got:

“- Qîzamina delal, xwe baş û oldar bik, Xwedê tim te biparêze û ez jî tim firdewsê de li te binêrim û ez ê li cem te bim.

Piştê çavên xwe da ser hev û mir. Qîzika ciwan her roj diçû ser gora diya xwe û digiriya, her tim baş û oldar bû. Zivistan hat û gora diya wê ji berfê wek rûpiştêkî spî dabû ser xwe, le bihar hat û berf heliyan, mêrik çû ji xwe ra jinek din anî.

Jina nû bi xwe re du qîz anî rûyen wan xweşik bû, lê dilên wan reş û tarî bû. Piştê ji bo qîzika sêwî demên xirab dest pê kir.

Wusa got e: “Tu odeya hevşê de li cem me bimîne?”

“Wan kesê kû xwarin dixwazin pewîste xwarinê maf bikin. Ew berdestî yên aşxaneyê tişkî dinê nîne.”

Kincên wê yên xweşik ji wê standin û kincê kevn û gemar dan wê, pêlavên textîn xistin lingên wê.

“Li dotmîra bêtir binêrin, çawa xwe xemilandiye!” bi qêrînê gotin û kenîyan û wê şandin aşxaneyê. Ji destê sibê heya nîvê şevê karên giran pê didan kirin. Sibê zû radibû û ji bîre av dikişand, agir vedixwist, şîv çêdikir û cilên qirêj dişûştin. Digel vê yekê xuşkên wê jê re îşkence jî dikirin. Ji xencî wan tiştan qîzên demariya wê polik û nîsk diavêtin nav xwelî û jê re digotin tu yê berhev bikî. Êvarî hingî karên dijwarî dikir pir dibetilî lêbelê nivînek wê jî tunebû tê de raketa ji bo wî li ber tifikê wesa xwe digirt û qey wek nav xwelîyê de radiket kincên wê qirêj û gemarokî bû ji bo wî jê re digotin pisînga xwelî.

Rojekê bavê wê çû bazara mezin û ji qîzên dêmarî pirsî, got ka dema ez vegerim çî ji we re çî bînim?

Yekê ji wan got, ji min re “kincên baş” ya dinê jî “durr û xişir” got. Sîndrella tu çî dixwazî? got.

“Tiştê ez ji te dixwazim ser rêya malê de şaxê şewqatê ket ji min re bîne bavê min.”

Lewma çaxa vegerîya ji bo qîzên demariyê kincên xweşik û durr û xişir stend. Ji Sîndrella jî ser rêya kesk şaxek dara findiqê li şewqê wî ket û wî şaxa şikand û jê re anî. Sîndrella ji bave xwe sipas kir û şaxa dara findiqê girt û bir ber gora diya xwe çand. Hingî ku digiriya hesirên çavê we herikî u wî şaxa av da û şax bû dar. Sîndrella ji bo dara xwe bibîne rojê sê caran diçû ser gorê, digiriya û bergeran dikir. Çaxa diçû her tim çûkek spî li ser dara we hêwirîn dibû û çaxa daxwazêk Sîndrella hebûna her tim bi cîh tanî.

Îja jî sê roj ji bo lawê key ji xwe ra jinek bibîne di nav welat çiqas qîzên xweşik hebûye ba wan kirin û ji bo key ji nav wan de bûkek hilbijêrîne mihîrîcanek çêkirin. Key ba her dû qîzên demariyê jî kiribû û ew pir kefxweşbûn ba Sîndrella kirin û gotin “zû porên me çêke, kince me bîne, solê me paqij bike em ê herin mihîrîcanê”

Sîndrella çaxa ev tişt ji wan bihîst giriya lewra pir ji dîlanan hez dikir û çû ba demariya xwe jê re lava kir got ez jî herim mihîrîcanê “Çi? Tu jî?”

Dêmarî got “Hemû kincên te gemariye û solên te tune yê û tu dixwazî dîlan biki herî mihîrî canê!”

Lêbelê Sîndrella ji daxwaza xwe hêtir kir pişt re dêmarî “Min teyîfîkêk nîsk avêt nav xwelî tu hemû nav du saetan de bineqîne heke te qedand, tu jî dikarî werî mihîrîcanê”

Qîzika ciwan çû ber derîyê bexçe û wusa qîrand:

“Kevokên nazîk û qumrîyan hemû çûkan di nav xwelî de nîsk henin, werin di nav xweliyê de wan nîskên baş bineqînin û texin teyîfîkê û nîskên xirab jî hûn bixun.”

Pişt re du kevokê spî hatin aşxanê û pişt re çendek qumrî û dawîye de ji firdewsê koma çukan hat û nav xweliyê de hêwirîn, kevokan bi nikilên xwe yek yek nîsk hilbijartin û çûkên dine jî nikilên xwe lêxistin û nîsk xistin teyîfîkê. Di nav nîv saetan de de nîsk hemû hilbijartin û çûk hemû firîyan û çûn.

Pişt re qîzika ciwan bi kefxweşi teyîfîka nîska bir cem dêmarî û got qey ez ê herim mihîrîcanê. Demariya wê “Na! Sîndrella kincên te ne gorî dîlanê ye û tu nîzanî dîlan biki ew ê bi te bikenin. Sîndrella xeyal şikestî bû girîya û dêmarî jê re got “Di nav xweliyê de du teyîfîk nîskê paqij û rind berhev bike pişt re tu dîkanî bê mihîrîcanê, Sîndrella got “Na! Bi derfet nîne.” Pişt re dêmarî pişt xwe lê zivirî û bi lez çû ba her du qîzên xwe.

Li malê kesek nemabû Sîndrella çû ser gora diya xwe û li bin dara findiqê, di bin deviya de, giriya.

“Dara biçûk, dara biçûk li ser min xwe bihejîn

Zêr û zîv bibarin ser min û dora min bigrin”

Piştîre çûkêk, kincek zêr, şimikek hevrişim zêr û zîv ji darê avêtin cem wê. Zûka cilên xwe li xwe kir û şimika xwe xist lingê xwe û çû mihriçanê. Lêbelê dêmarî û keçmarî ew nasnekirin gotin qey dotmîrekî xerîb e. Di nav kincên zer de pir xweşik bûbû. Ew digotin qey Sîndrella li malê di nav xwelîyê de nîskan ber hev dike. Lawê key hat cem wê û xwe pê da naskirin, desten wê girt û bi wê re dilan kir. Ji bo Sîndrella li ba wî be ser lingan sekinî û nehişt yekî dinê were wê rake dîlanê, dema kî dihat cem Sîndrellayê, Mîrza digot “Ew hevala min e”.

Sîndrella çaxa bû êvar got ez ê herim malê lê mîrza nizanibû wê keçika ciwan li kuderê rûdinê ji bo wî jî jê re got ez ê alîkariya te bikim, lê belê Sîndrella reviya û xwe avêt nav mala kevokan. Mîrza bendî bavê xwe ma ji key re got keçik xwe avêt mala kevokan. Bavê mîrza go ew ne Sîndrella ye wer fikirî. Bivir û satorê anîn û mala kevokan jêkirin û xirab kirin lêbelê keskî tunebû. Sîndrella lez kir û xwe ji mala kevokan avêt û çû ber dara findiqê kincên xwe ji xwe kir û danî ser gora diya xwe. Çûkan kincên wê birin. Kincên gewr û gêmarî li xwe kir û çû ber tifikê rûnişt. Çaxa kêtin hundire malê Sîndrella di nav xwelîyê de rûniştî bû, cilên wê yên gêmarî lê bû.

Roja dinê dîsa mihriçan destpêkir û malbata Sîndrella çû mihriçanê. Sîndrella çû ser gora diya xwe û li bin dara findiqê di bin deviya de giriya.

“Dara biçûk, dara biçûk li ser min xwe bihejîn

Zêr û zîv bibarin ser min û dora min bigrin”

Piştire çûkan kincên hîn xweşik anîn, Sîndrellyê ew cil li xwe kirin û çû mihîrcanê mêvanan ji xweşikbûniya wê metel man. Heya ew hat Mîrza bendî wê ma, destên wê girt û bi wê re dîlan kir. Nehîşt yekî din wê rake dîlanê, dema kî dihat cem Sîndrellyê mîrza digot Ew hevala min e”.

Sîndrellyê çaxa bû êvar got ez ê herim malê lêbelê mîrza nizanibû wê keçîka ciwan li kuderê rûdinê ji bo wî jî jê re got ez ê alîkarîya te bikim. Lêbelê Sîndrella ji wî qetiya û reviya bexça pişt malê, li vir darek bi revnaq û tije hirmî hebû; Sîndrella xwe wek sivorî nav şaxê darê xist û venda bû. Mîrza hey a bavê wî hat li vir sekinî û wê keç a ciwan ji vir çava rewiya ji bavê xwe re got. Bavê Mîrza xwe bi xwe got ew ne Sîndrella ye. Bivirek anî û dar jekir lê Sîndrella ne li wir bû. Sînderalla çû ber dara fîndiqê kincên xwe ji xwe kir û danî ser gora diya xwe. Çûkan kincên wê birin. Kincên gewr û gêmarî li xwe kir û çû ber tîfikê rûnişt.

Roja sisêyê dîsa mihîrcan dest pê kir û malbata Sîndrella çû mihîrî canê. Sîndrella çû ser gora diya xwe û li bin dara fîndikê di bin deviyan da giriya.

“Dara biçûk, dara biçûk li ser min xwe bihejîn

Zêr û zîv bibarin ser min û dora min bigrin”

Û çûkan kincek ji berê xweşîktir û şimikek zêr jê re anîn. Sîndrella dîsa çû mihîrcanê û mevanê key dîsa dev vekirî man. Mîrza bendî wê ma, destên wê girt û bi wê re dîlan kir. Nehîşt yekî din wê rake dîlanê, kî dihat cem Sîndrellyê Mîrza digot “Ew hevala min e”.

Bû êvar Sîndrellyê go ez ê herim malê Mîrza hey a derva bi wê re derket, Sîndrellyê ji bo Mîrza pişt wê neçê zû kir û reviya le Mîrza pilanek çêkiribû; pêlikên qesrê qîr lekiri bû ji bo Sîndrella hedî here lêbelê Sîndrella fera şimika çep nav qîrê hişt û dîsa reviya.

Mîrza şimika zêr, zirav û biçûk girt. Mîrza dûv re sibê çû cem bavê xwe û jê re got: “Wê şimika zêr li lingê kê be ew ê bibe bûka min. Wê keça ciwan bibînin.”

Her du keça dêmarî kefxweş bûn digotin destên me û lingên me pir xweşik in. Keça mezin çû jorê ket oda xwe û şimik xist lingê xwe lêbelê şimik jê re nebû diya keçikê kêr xist destê xwe û tilikê lingê wê jêkir û jê re got tu bibe keybanû te birev nere loma tilikê linge te ji te re hewce nîne. Keçika mezin lingê xwe xist nav şimik û çû cem Mîrza. Mîrza we li hespê xwe kir û hespê xwe ajot. Li ber gorîstanê diçûn ser dara findiqê du kevok hebûn û qirîna wan bû.

“Cih hûn diçin, Cih hûn diçin

Şimika we de xwîn heye

Şimik pir çûk,

Ew ne bûka rast e”

Mîrza li şimikê nerît xwîn jê te, mîrza hespê xwe ajot bûka çewt bir danî malê. Mîrza go wê ya ne bûka rast e, keça din jî şimik têx linge xwe keça çûk şimik girt û çû oda xwe tilikên xwe rehet xist şimik lêbelê pahniya wê neket şimikê diya keçikê kêr xist destê xwe û pahniya lingê wê jêkir û jê re got tu bibe keybanû te birev nere loma pahniya lingê te ji te re hewce nîne.

Keçika çûk pahniya xwe jî xist şimike û çû cem Mîrza. Mîrza wê li hespên xwe kir û hespên xwe ajot. Li ber gorîstanê diçûn ser dara findiqê du kevok hebûn û qirîna wan bû.

“Cih hûn diçin, Cih hûn diçin

Şimika wê de xwîn heye

Şimik pir çûk,

Ew ne bûka rast e”

Mîrza li linge wê nerî gorê wê gêmarî bûye û linge we xwîn jê te, mîrza hespê xwe ajot bûka çewt bir danî malê. Mîrza go wêya ne bûka rast e. Ji wan keçên we xeyrî keç tunê.”

Merik got “Na! Bi tenê jina min a mirî pişt xwe Sîndrella hiştiye ew jî ne bi derfet e.” Lêbelê Mîrza go Sîndrellayê bînin, dêmarî got “Na! Ew pir qirêj û gêmarî ye ez nahêlim tu wê bibînî.” Lêbelê Mîrza got “Wê bînin!” û wan jî ew anîn.

Keçik destê xwe û rûye xwe gelek paqij kir û ket hundir, çû ber Mîrza û silav dayê. Ser kursî rûnişt û şimika zêr xist lingê xwe, Mîrza li rûye wê nerî û ew naskir got: “Wêe keçika ku min bi wê dîlan kiriye. Sîndrella bûka rast e.”

Dêmarî û keçmarî metel man û rûyên wan zer bû. Mîrza, Sîndrella rakir xist ser hespê xwe û hespê xwe ajot. Li ber gorîstanê diçûn, ser dara findiqê du kevok hebûn û qirîna wan bû.

“Cih hûn diçin, Cih hûn diçin

Şimika wê de xwîn tune

Şimik pir çûk nîne

Ew bûka rast e”

Kevokan ew tişt gotin, dûv re hatin ser piyê Sîndrellayê yek rastê yek çepê û wisa man. Daweta Mîrza û Sîndrellayê çaxa dest pê bike keçmariyan xwe baş kirin, gotin em xwe baş bikin ew ê dawetê de ba me jî bikin. Xêlî ber rêya dêre da dest pê kir, keçmariya mezin xwe da hêla rastê û keçmariya çûk jî xwe da hêla çepê birêw diçûn. Kevokan bala xwe dabûn keçmariyan û li wan dinerîn. Çaxa vegeriyan keçmariya mezin xwe dabû çepê û keçmariya çûk jî xwe dabû rastê.

Xuşkên keçmarî hingî tiştên xirab kiribûn nehiştin roja din bên. Daweta Sîndrellayê ji wan re qedexe kirin.

2.2. ÇÊLEKA ZÊRÎ-SÊWÎKÊ

Zilamek hebû du jinê wî hebû, herdu jin bi carekê welidîne û her yeke ji wan kîzek aniye. Jina mezin navê qîza xwe dideyne Fatma û jina biçuk jî navê kîza xwe dideyne Eyşo. Piştî çêbuna wan keçikan bi demek kurteke şûn de diya Fatmayê nexweş dikeve û dimre navê Fatmayê dibe Fato û sêwî dimîne û dikevê ber destê jinbava xwe, herdu keçik mezin bûn û gîhan çaxên îş. Jinbava Fatmayê rojekê qîza xwe û rojekê jî qîza hêwiya xwe dişande ber dewaran, gava jinikê herdu qîzîk dişandin çolê herroj gulokêk ta jî dida wan da ku li ber heywana biresin. Lê roja ku qîza jinikê diçû ber dewaran wê hem xwarina xweş didayê û guloka biçûk jî didayê ku biresê, lê roja Fato diçû ber dewaran wê tene nanêkî zuha û seriyêk pîvazên hişk didayê û gulokekê mezin jî didayê ku biresê. Ha bi wî awayî çî karê giran hebûya jinbavê bi Fato dida kirin û bi keça xwe jî kare sivik dida kirin. Fatmayê jiber karê giran qels dibû jar dibû her tim birçî dima û bi zîkê xwe têr nan nedixwar. Lê keça jinbava wê delal dibû, rind dibû her diçû bejn davêt û roj bi roj sipêhîtir dibû gava diya Fato dimrê çêlekekî wê ya malê ya zerî dimîne ew çêlek jî kinarê xwedê û her tim diçû li ber keça sewî disekinê û pê şad dibû her wekî ku jê hezdir û pê re dileyîst.

Roja ku Fato ber dewaran bûya çêlekê jî dewaran re mîna ku gavantî dikir nedihîşt heywan belav dibin da ku keçik bi wan re neweste. Lê roja ku Eyşo li ber dewaran bû çêlekê li dewaran dixist û wan jî hev belav dikir, wisa dikir ku Eyşo nikaribe bîstekê jî xwe ra rûnê û behna xwe berdê. Dibêjin pîrek hebû her tim çolê diçû ba keçikan û ji wan dixwest ew spîyên serê wê da bikujin. Çî roja ku pîrê diçû ba Eyşoyê û digote spîyên serê min bikuje, Eyşo digot pîrê dewar nasekinin û ez gulok jî diresim. Wele ez nikarim spîyên serê te bikujim. Pîre bala xwe dayê ku Eyşo spîyên sere wê nakuje. Rojekê gotê; keça min ewarekê gava tu herî male wê du av ber te bibuhirin:

Avek reş e û avek spî ye. Tu xwe bi ava reş bişo xwe rind paqij bike, lê bi xwe ava spî neşo îja tê hîn xweşik û dêlaltir bibî. Lê roja ku pîrê diçû ba Fatoyê û digote spîyen serê min bikuje Fato digote: ser çavan pîrê serê xwe datanî ser çoga Fatoyê û wê spîyen serê pîrê dikuşt. Û ji xwe çeleka diya Fatoyê hay ji dewaran dima û nedihîşt ku ew belav bibin. Ha wisa Fato hem guloka rîse jinbava xwe dirêsa hem jî spîyên serê pîrê dikuştin. Çi caran Fato spîyên serê pîrê dikuştin, kêfa pîrê pir dihat û rehma Xwedê li gora diya wê dibarand. Ha bi wî hawayî gelek roj buhirîn, rojekê pîrê gote Fatoyê; keça min ewarekê gava ku tu here malê, we du av di ber te ve bibuhirin.

Avek reş e û avek spî ye, tu xwe bi ava reş neşo, lê xwe bi ava spî bişo û rind xwe paqij bike paşê here malê. Îja tê roj bi roj tu yê xweşiktir û delaltir bibî. Li nezi mala keçikan du hişkî newal hebûne. Êvareke çaxa ku Fato dewar anî malê nêrî ku di newalêke de avek spî diherike û di yeke de jî aveke reş diherike. Fato di ser ava reş de dibuhirî û ne dihişt ku ew şil bibe. Lê çaxê ew digiha ava spî kincen xwe derdixist û laşê xwe pê dişuşt û hêj dewar birin û çû malê. Lê rojekê êvarê gava Eyşo dewêr anîn malê dît newalêke de avekî reş û yeke de jî aveke spî diherike. Wê bi xwe ava reş şuşt û ser ava spî de bihurî, nedihîşt derekê wê şil bibe û çû malê. Di ve navê re demek bihurî jinbava Fatoyê dît her ku diçe Fato xweşik û delal dibe ku şewq li ser çavên wê diçe û hema diçirisê ku her nava dilên mirov.

Lê keça wê jî her ku diçe xweşikitiya xwe wenda dike û xêrabtir dibe genî û gêmarî dibe. Xwe bi xwe got: Wele ez gulokê piçûk didimê keça xwe û ji xwarina Fatoyê xweştir jî didimê. Ez gulokekê mezin didimê Fato û tenê nan û pîvazêk didim wê. Çima ew ji keça min xweşiktir dibe? Ev çi mesele ye ku wiha dibe. Şevê her du keçik ketin cihê xwe ku rakevin. Fato qêrîn bi xwe xist. Lê Eyşo hîn şîyar bû, dîya wê jê pirsî; keça min tu çima wilo qels û nedelal dibî. Eyşo ji diya xwe ra got yadê roja ku ez ber dewara me çeleka diya Fato hema dewaran dixê û wan ji hev û du belav dike. Îja pirî ku ez li pey wan dibezim heya ewarî lingê min nakevin bin min. Ez gelekî bi wan re diwestim û ji hal dikevim û bi wan re dimirim. Diya Eyşoyê got: Keça min de tu deng

neke, em ê çêleka zerî serjêkin. Ew çax tu jê xilas bibe. Çaxa ku Fato ew deng ji jinbava xwe bihîst, edî xew neket çavên wê û xêma çêleka diya xwe xwar.

Dora dewaran ya sibe ya Fato bû. Jinbava wê nanek û pîvazek xist tûrikê wê û dewar xistin peşîyê û Fato dewar birin çolê. Li çolê Fato çû ber çêleka zerî û bi ser de girîya û got: Rebenê wele wê te ser jê bikin. Xwe ji keça jinbava min re mulayîm bike. Çêlek hate zimên û got; wele gava min ser jê bikin ez ê goşte xwe bi wan tahl bikim. Lê gawa tu bixwe wê bi te xweş bê. Bira qe min ser jê bikin Fatmayê tu guh bide min ez dizanim ku jinbava te ew ê min bide ser jê kirin lê ew û zaroyên xwe nikarin goştê min bixwin. Ez ê goşte xwe bi wan tahl bikim û bi te xweş bikim. Îja wê goştê min bi te cîrana belav bikin lê gava ku te goştê min da cîranan bila hestîyê min navêjin û şûn de bidin te û tu wan hestîyan bibe axur û têxe afirekî û ka bavêje serî û veşêre. Pişti du heftêyan îja tu here lê binere. Ew çax tu yê bibini. Tu ji bo min negirî ser jê kirina min ji bo te bi xertir ê. Di wê navê re çend roj bihurîn şevêkê jinbava Fatoyê got ji mêre xwe re.

Diya Fatokê mir û çû, qene me je re heywanek jî ser jê nekir û boraq jî neda, me ne xerêk li wê da û nejî xeratek. Ma wisan çê dibe? Jinik guneh e û wê'l qiyametê peya me bimîne, mêrik gote: Wele raste de ka em gayekê ser jê bikin, jinikê got: ma em ê çima ga ser jê bikin wa çêlekek wê heye em ê helal melale wê ser jê bikin xêrtir e. Roja din kêr û sator anîn tûj kirin û çêleka zêrî avetin êze ser jê kirin û goştê wê hûr û parî kirin. Evarê beroşeke mezin danîne ser agir û goşt pijandin gava ku goşt rû kirin ser sifrê lê ciwiyan ku bixwin lê nêrîn ku goşt tahl e çi parîyên ku xistin devê xwe û nikarîbûn daqurtandana û ji devê xwe avêtin. Lê Fato goşt xwar û heç deng nekir. Jinbava wê xwe bi xwe got; ew keçik te'ma deve xwe nizanê bila bixwe bixwe belkî pê bimre em jê xelas bibin. Îjar goştê ku ma bû hemî xist senîyan û da destê Fatoyê û got; keça min tu xêra diya xwe bi destê xwe bibe bide cîranan Fatoyê ew goşt hemû bir da cîranan gava wê goşt da kîjan cîranê jî got; ew goşt xêra diya min e lê hestiyê wê navejin dîsa şûn de bidin min.

Roja din Fato çû malên cîranan da senîyên xwe bîne ew hestî jî tev anîn û birin, çû axurê xistin afirekî û ka avêt serê tamartin. Piştî du heftêyan Fato çû li wan hestîya nerî bala xwe daye ku gişk bûne zêr, zîv, akût, almas û kincên xweşik, kefa Fato pir hat her carê yekê der anî û li xwe kir û zêr xist stuyên xwe dîsa derxistin û xist şûnê û ka avet serê û veşart. Daweta kurê axê bû, jinbava Fato, mêrê wê û keça wê Eyşo rabûn çûn dawetê, Jinikê got; Fatoyê tu li malê be heya em werin tu malê bi malê, firaqan bişo û karê din bike. Ew gava çûn da'wete Fato jî rabû zûka karên malê xelas kir û çû axurê ka ji ser afirê zêran da alî û kincên xweşik li xwe kirin zêr, zîv, aqût û almas bi xwe ve kirin berê xwe da mala axê û çû ba dawetê. Li wê xwe ji jinbava xwe dûr kir û ji xwe re sekinî. Carekê çavên Eyşo bi Fatoyê ketin û wê nîşanî diya xwe da û got; yadê yadê ew keçika han Fatoka me ye, diya wê got; vêya xweşik e û Fatoya te ser birişk e, na keça min Fatmaya tê niha li malê ye.

Berî ku dawet xelas bibe Fato zû vedigeriya çû ku here malê li perê gund lawekî axê lê rast tê, gava lawê axê ew dît ji delalî û bedewtiya wê ra lal bû û hema ziloq ma lê nerî. Fato jî şerm kir û xwe ji lêwîk averê kir çû di ser çayêkî re hil diqewizî û hema ferika şimika wê ji nigê wê ket. Fato li şimika xwe nebû xwedî û bi lez çû. Kurê axê jî çû rahişt wî fera şimikê û lê nêrî dît ku pir nazik, xweşik û birqokî ye xwe bi xwe got; ew şimik ya kîjan berbûyê ye gelo ma ew qasa kû ew delal e lê ka xwedîya wê çi qasî delal e ew keçik kî be wellehî ji min re ye. Kurê axê şimik dan hinekan û mal mal gerandin, pirsîn ka şimika kê ye û nigên keçikan ceribandîn. Lê ew şimik li nigên kesî nehat ne jî xwedî lê derketin. Gava ew çûn mala jinbava Fatoyê jî û xistin nigê Eyşo, li nigên wê jî nehat û jêr çûk bû. Jinbava Fato hey zorî da nigê keça xwe lê kir nekir nigê keça wê neket şimikê.

Peyayên lawê axê gotin jinbava Fato; ka keça hewiya xwe jî bîne em nigê wê ji bicêribînin û îja herin malê. Çaxê Fato hat şimik xist nigê xwe tam gora nige wê bû. Zilamên lawê axê rabûn şûnde çûn ba kure axê û gotin; şimik li nigê Fatmaya sewî hatiye. Kurê axê rabû bi xwe çû mala bavê Fato û şimik li nigê Fato ceriband erê şimik

lê hat û meriv dibejê ku jê re hatiye çêkirin, pişt re got bavê wê, min wê fera şimikê lingên kîjan keçê ceribandiye lê nehatiye an jê re mezin bûye an jî çûk bûye lê qey tu dibe jî ku nigên Fatmayê ra hatiye çêkirin. Îjar ez dixwazim tu wê keça xwe bidî min. Lawik çû malê û meselê ji diya xwe re got û xwest ku herin Fato jê re bixwazin çend roj şûnde axê û jina xwe çûn.

Fatoya sewî ji bave wê xwestin. Bavê Fato û Fatoyê ji wan re herê kir. Piştî çend rojan mala axê dest bi dawetekê din kirin û def û zirne lê dixin, berx û beranan ser jê dikin û sofre raxistin. Mala axê çûn ku bûka xwe siwar bikin, jinbava Fato kincê bukatiyê keça xwe Eyşo kirin û Fato jî bir xist tenûrekê û tê de veşart. Dawetvaniyên Mala axê gava bûke derxistin ku siwar bikin dîkêk derket ser darekê û got; Êûûû Eyşoka Elî pirzik xistin mexfurê, Fatma xweşik xistin tenûrê. Diya Eyşo xwe bi xwe dibêje li min kurê ew dîk çi tê bayê, ka wî bigrin ser jê bikin lê berbûriyên mala axê ji dîk fehm nakin û çû diya bukê pirsîn dîk dibeje çi? Çima tu per wera dixeyidî.

Diya buke ew gotina dîk ji wan re negot. Berbuyî tev çûn ba dîk û pê hesiyan dîk jî hey wisan gazî dike û dibêje; Êûûû Eyşoka Elî pirzik xistin mexfurê, Fatma xweşik xistin tenûrê. Piştî dîk tê ziman û mesela Eyşo û Fato dibêje berbûyan û dide peşîya wan û wan rast dibe ser tenûrê lê nerîn ku Fato tenûrê de ye. Fato ji tenûrê derxistin anîn kincê bûkantiyê lê kirin Eyşoyê jî ji mexfûre derxistin û Fatokê xistin mexfûre ji kurê axê re birin. Fatoya sewî li vir miradê xwe şad bû û çîroka min jî li vir xelas bû.

BEŞA SÊYEM

BERAWERDKIRIN

3.1. BERAWERDKIRINA ÇÎROKA ÇÊLEKA ZÊRÎN-SÊWÎKÊ Û SÎNDRELLA-ASCHENPUTTEL

Lehengê çîrokê Grimm, Sindrella (Aschenputtel) û lêkolîna çîroka Kurda Çêleka Zêrî-Sêwîke li nav gelê Tirkiye de dijîn du varyantê wan me dît.

Her du çîrok jî navê xwe ji lehengê xwe standine. Lehenga çîroka Çêleka Zêrî-Sêwîke Fato qîzek ciwan e, lêbelê hingî kar pê dîkin qelsû û lawaz bûye. Lehengê Sindrella jî sêwî yê û cilên gemar û xweli li xwe dike, loma wî navî lêkirine.

Sindrella (Aschenputtel) bavê wê dewlemend ê lê bavê Fato hejar ê. Diya Sindrellayê (Aschenputtel) nezîkî mirina xwe ba qîza xwe yekane kir û ber nivînên xwe jê re “- Qîza min a delal, xwe baş û oldar bike, Xwedê tim te biparêze û ez jî tim fîrdewsê de li te binêrim û ez ê li cem te bim” dibêje lê derbarê diya Fato de tu agahî tune.

Bavê Sindrellayê (Aschenputtel) piştî jîna wî mir nav salekî de zewicî. Bavê Fatoyê berî diya wê bimire zewicî bû. Nav gelê Ewropayê de li gorî baweriya xiristiyanîyê merikêk tenê dikanîbû jinek bianiya lêbelê di nav Misilmanan de merikêk dikanîbû çar jin bianiya.

Her du çîrokan de jî lehengan diya wan dimire û nav xemgîniyekê de mezin dibin. Sindrella (Aschenputtel) piştî zewaca bavê xwe du xuşkên wê çedibin. Fato bi tenê xuşkêk wê çêdibe. Di çîroka Sindrellayê (Aschenputtel) de dêmarî û her du qîzên xwe xirabî pê dikin. Fato hew dêmarî lê xirabî dike.

Sindrella (Aschenputtel) û Fato ji sibê heta nîvê şevê karan dikin û eynî xirabiyê dibînin. Bavê Sindrellayê (Aschenputtel) çaxa vegeriya mala xwe ji bo qîzên demariyê kincên xweşik û durr û xişir stend. Ji bo Sindrellayê jî ser rêya xwe şaxek dara findiqê li şewqê wî ket û ew şaxa şikand û jê re anî. Sindrellayê ji bavê xwe re sipas kir û şaxa dara findiqê girt û bir ber gora diya xwe çand. Hingî ku digiriya hesirên çavê wê herikî û ew şaxa av da û şax bû dar. Sindrella ji bo dara xwe bibîne rojê sê caran diçû ser gorê, digiriya û bergeran dikir. Çaxa diçû her tim çûkek spî li ser dara wê dihêwirî û çaxa daxwazek Sindrellayê hebûna her tim bi cih dianî.

Di çîroka Kurdî de Rojekê Fato li ber dewaran bûye çêlekê ji dewaran re mîna ku gavantî dikir nedihîşt heywan belav dibin da ku keçik bi wan re neweste. Dibêjin pîrek hebû her tim diçû çolê ba keçikan û ji wan di xwest ew spîyên sere wê de bikujin. Çi caran Fato spîyên sere pîrê dikuştin, kêfa pîrê pir dihat û rehma Xwedê li gora diya wê dibarand. Bi vî awayî gelek roj buhirîn, rojekê pîrê gote Fatoyê; keça min êvarekê gava ku tu herî malê, wê du av di ber te ve bibihurin. Avek reş e û avek spî ye, tu xwe bi ava reş neşo, lê xwe bi ava spî bişo û rind xwe paqij bike pêş here malê. Îja tê roj bi roj xweşiktir û delaltir bibî. Li nezî mala keçikan du hişkî newal hebûne. Evarekê çaxa ku Fato dewar anî malê nerî ku di newalêkê de avek spî diherike û di yekê de jî aveke reş diherike. Fato di ser ava reş de dibuhirî û nedihîşt ku ew şil bibe. Lê çaxê ew digiha ava spî kincên xwe derdixist û laşê xwe pê dişuşt û hêj dewar birin û çû malê. Jinbava Fatoyê dît her ku diçe Fato xweşik û delal dibe ku şewq li ser çavên we diçe û hema diçirise ku her nava dilên mirov.

Mirov dibîne ku her du çîrok jî dişibin hev lêbelê çîroka Sindrellayê (Aschenputtel) de dara findiqê çûkên spî alîkariya wê dikin û çî daxwaza wê hebe bi cih

tînin. Çîroka Çêleka Zêrî de jî çêlek û dîk alîkariya Fatoyê dikin. Çîroka Sindrellayê (Aschenputtel) de çûkên spî giyana dîya wê ye û tim daxwazê wê bi cih tîne û çaxa di tengasîyekî de be wê diparêze. Çêleka zêrî jî mîna giyana dîya Fato ye û her tim alîkariya wê dike û wê diparêze û hestiyên wê dibin kinc, zêr, zîv, almas û Fato bi wan xwe dixemilîne.

Îja jî sê roj ji bo lawê key ji xwe ra jinek bibîne di nav welat çiqas qîzên xweşik hebûye ba wan kirin û ji bo key ji nav wan de bûkek hilbijêrîne mihîrîcanek çêkirin lêbelê dêmarî û her du qîzên wê nehiştin Sindrella (Aschenputtel) her mihîrîcana key.

“Dara biçûk, dara biçûk li ser min xwe bihejîn

Zêr û zîv bibarin ser min û dora min bigrin”

Piştî çûkek, kincek zêr, şimikêk hevrişim zêr û zîv ji darê avêtin cem wê. Zûka cilên xwe li xwe kir û şimika xwe xist lingê xwe û çû mihîrîcanê. Çêleka zêrî jî alîkariya Fato kir û ew jî çû daweta lawê axê.

Sindrella (Aschenputtel) çaxa çû mihîrî canê lawê key hat cem wê û xwe pê da naskirin, desten wê girt û bi wê re dilan kir. Ji bo Sindrella li ba wî be li ser linga sekinî û nehişt yekî din wê rake dîlanê, kî dihat cem Sindrella Mîrza digot “Ew hevala min e”. Fato çîrokê de lawê kurê axê we dibîne û wê keçika xweşik dipirsê.

Di çîroka Sindrellayê (Aschenputtel) de çaxa keçik direve ferikek şimika xwe li ser pêlikan de nav qîrê dihêle û direve. Mîrza wî fera şimikê nav welat de digêrîne û keçikê digere. Çîroka Çêleka Zêrî de jî lawê axê di nav gund digêrîne û keçika xweşik digere.

Di çîroka Sindrellayê (Aschenputtel) de dêmarî paniya qîza xwe jê dike û tiliyên qîza xwe dinê jê dike lêbelê çûka spî nahêle qîzên wê bibin bûk.

Keça mezin çû jorê ket oda xwe û şimik xist lingê xwe lêbelê şimik jê re nebû diya keçikê kêr xist destê xwe û tilikê lingê wê jêkir jê re got tu yê bibî keybanû tê birêv nerî loma tilikê lingê te jî te re hewcê nîne. Keçika mezin lingê xwe xist nav şimik û çû cem Mîrza. Mîrza wê li hespê xwe kir û hespê xwe ajot. Li ber gorîstanê diçûn ser dara findiqê du kevok hebûn û qirîna wan bû.

“Cih hûn diçin, Cih hûn diçin

Şimika wê de xwîn heye

Şimik pir çûk,

Ew ne bûka rast e.”

Mîrza li şimikê nerî xwîn jê tê, mîrza hespê xwe ajot bûka çewt bir danî malê.

Keçika çûk pahniya xwe jî xist şimike û çû cem Mîrza. Mîrza wê li hespên xwe kir û hespên xwe ajot. Li ber gorîstanê diçûn ser dara findiqê du kevok hebûn û qirîna wan bû.

“Cih hûn diçin, Cih hûn diçin

Şimika wê de xwîn heye

Şimik pir çûk,

Ew ne bûka rast e.”

Mîrza li lingê wê nerî gorê wê gêmarî bûye û lingê wê xwîn jê tê, Mîrza hespê xwe ajot bûka çewt bir danî malê. Mîrza go wêya ne bûka rast e. “jî wan keçên we xeyrî keç tunê.”

Merik got “Na! Bi tenê jina min a mirî pişt xwe Sîndrella hiştiye ew jî ne bi derfet e.” Lêbelê Mîrza go Sîndrellayê bînin, dêmarî got “Na! Ew pir qirêj û gemarî ye ez nahêlim tu wê bibînî.” Lêbelê Mîrza go wê bînin û wan jî ew anîn.

Keçik destê xwe û rûye xwe gelek paqij kir û ket hundir, çû ber Mîrza û silav dayê. Ser kursî rûnişt û şimika zêr xist lingê xwe, Mîrza li rûye wê nerî û ew naskir go “Ew keçika ku min bi wê dîlan kiriye Sîndrella bûka rast e.”

Dêmarî û keçmarî metel man û rûyên wan zer bû. Mîrza, Sîndrella rakir xist ser hespê xwe û hespê xwe ajot. Li ber gorîstanê diçûn ser dara findiqê du kevok hebûn û qirîna wan bû.

“Cih hûn diçin, Cih hûn diçin

Şimika wê de xwîn tune

Şimik pir çûk nîne

Ew bûka rast e.”

Lawê key bi Sindrellayê (Aschenputtel) zewicî û bextîyar bûn.

Çîroka Çêleka Zêrî de jî de berê Eyşo fêra şimikê dixê lingen xwe lêbelê şimik jî lingen wê nabe. Fato şimik çaxa dixê lingen xwe şimik gora lingen wê ye. Berbûyên axê derin mala axê û agahî didin lawê axê. Fatoya sewî jî bave wê xwestin. Bavê Fato û Fatoyê jî wan re erê kir. Piştî çend rojan mala axê dest bi dawetekê din kirin û def û zirne lê dixin, berx û beranan ser jê dikin û sofre raxistin. Mala axê çûn ku bûka xwe siwar bikin, jinbava Fato kince bukatîyê li keça xwe Eyşo kir û Fato jî bir xist tenûrekê û tê de veşart. Dawetvaniyên mala axê gava bûkê derxistin ku siwar bikin, dîkek derket ser darekê û got;

“Eyşoka Elî pirzik xistin mexfurê

Fatma xweşik xistin tenûrê.”

Diya bukê ew gotina dîk jî wan rê negot. Berbû tew çûn ba dîk û pê hesiyan dîk jî hey wisan gazî dike û dibêje;

“Eyşoka Elî pirzik xistin mexfurê

Fatma xweşik xistin tenûrê.”

Piştîre dîk tê ziman û mesela Eyşo û Fato dibêje ji berbûyan û dide pêşîya wan û wan rast dibe ser tenûrê lê dinerîn ku Fato di tenûrê de ye. Fatoyê ji tenûrê derxistin anîn kincê bûkantiye lê kirin Eyşoyê jî ji mexfûrê derxistin û Fato xistin mexfûrê ji kurê axê re birin. Fatoya sewî li wir bi miradê xwe şad bû.

*Ku hewcê bê naveroka vê çîrokê ku em bejin; Naveroka çîrokê ev e; Ciya Zeynika zêra ku mir û bavê wê çu bi jineke dî re zewicî, zordestiya jinbava wê li ser wê û şuxulkirina wê weke xulamêkê, daweta kurê axê, Ji bilî Zeynika zêra amadekirina hemû keçikan ji bo dawetê, bi alikariya periya qeş çuyina Zeynika Zêra ji bo dawetê, di dawetê de dilketina kurê axê li ser **Zeynik** Zêra, Wextê ku Zeynika Zêra vegeriya malê şimikeke wê ji lingê wê ket, Kurê axê ku li xwediyê şimikê digere, weke hemû keçikan ceribandina Zeynika Zêra a şimikê. (Kurt, 2012: 3)*

ENCAM

Di vê xebatê de çîroka Ewropayê Sindrella û çîroka Kurdan a Çêleka Zêrîn wekî li ser rêbaza Propp hatîye sekinandin û berawirdiya her du çîrokan hat kirin. Bi vî awayî me dît ku di nava her du çîrokan da gelek hêmanên taybet hene. Her du çîrok jî navê xwe ji lehengên xwe distînin. Lehengên Sindrellayê jî sêwî ye û cilên gemar û nav xweli li xwe dike, loma wî navî lê kirine. Çîroka Sindrellayê (Aschenputtel) û Çêleka Zêrîn de çaxa keçik direve ferik şimika xwe li ser pêlikan de nav qîrê dihêle û direve.

Nav gelê Ewropayê de ji ber baweriya Xiristiyaniyê merikêk tenê dikanîbû jinek baniya lêbelê di nav Misilmanan de merikêk dikanîbû çar jin baniya. Dibe ku ji ber vê be di Sîndreallayê de piştî mirina dê, bav jinek din tîne. Ev jin jî xweyî du keçan e. Lê di çîroka Çêleka Zêrîn de du jinên bav hene.

Pirtûka Grimms Märchen International de çîroka Sindrellayê (Aschenputtel) versiyona heft welatî dide lêbelê ya Tirkîyê nade. Di pirtûka xwe de sê varyant tunene. Yek ji wan Sırmalı Pabuça Tirkî, Çêleka Zêrî yan Sêwîka Kurdî, û Elik û Fatika Zazakî di pirtûka wan de nayê dîtin.

Ji ber ku ziman bîngehê danûstendinê û ramanê ye. Zimanek xurt û dewlemend riya pêşketinê ya li ber zarokan hêsantir dike. Ji bo pêşxistina ziman jî tiştekî ji çîrokê xweştir û bikêrtir tune ye.

Çîroka gelêrî ji estetîk (bedewî) û afirêneriya hevpar (kolektîv) a çend hezar salî tê. Di hin çîrokan de karekterek neteweyî heye, deng û rengê jiyanê gelî, xwe di çîrokan

de dide der. Her çîrokbêjek li gor demê û hunermendiya xwe li vê afirêneriya hevpar, ciwanî û spehîtiyekê zêde dike. Bi vî awayî çîrok ji aliyê estetîk û naverokê ve xwe nû dike, temenê xwe jî dirêjtir dike. Çîrok dibin neynika civatê û çavkaniyeke bêhempa ji bo zarokan. Zarok li gor karîna xwe ji vê çavkaniyê gelek tiştan digirin bêtir ku haya mezinan jê hebe.

Çîrok ji bo zarokan model û qalibek jî pêşkêş dikin. Dema ew bixwazin li ser babetekê bipeyivin an binivîsin dikarin ji vê modelê kelk werbigirin. Zarokên ku gelek çîrok guhdarî kiribin, aliyê wan ê têgihîştinê bi pêş dikeve û dema ew bi serê xwe deqa nivîsarek an çîrokekê bixwînin, naverok û tevna deqê çêtir têdigihînin. Dema li ser pîrsekê hûr bibin, di heman demê de dikarin bi çend alternatîvan bifikirin ta digihînin bersîvekê. Ango bi tenê di alternatîvekê de asê nabin. Çîrok vê derfetê didin. Di dema guhdarîkirina çîrokan de carinan zarok pîrsên an şîroveyên welê dikin ku ew qet nayên bîra mezinan.

Zarok dîsan di temenek biçûk de bi rêya çîrokan hînî jiyanê dibin. Ji ber ku di çîrokan de hemû aliyên jiyanê hene. Baş û xerab, qencî û xerabî, rastî û çewtî, heq û neheqî û encamên wan.

Ji ber hindê jî gelek girîng e ku dê û bav, kal û pîr ji zarok û neviyên xwe re çîrokan bibêjin. Çanda kurdî ji vî aliyê ve gelek dewlemend e. Heke dîsan jî nikaribin an nizanibin çîrokan bibêjin, dikarin ji pirtûkan çîrokan bixwînin. Lê divê em ji bîr nekin, xwendin tu carî nikare şûna gotinê bigire. Çîrokbêj bi hêza deng, liv û tevgera parçeyên bedenê bandoreke mezin û sihêrî li ser guhdaran dikin. Tîpên li ser rûpelên pirtûkê ne xwedan vê hêzê ne.

ÇAVKANÎ (KAYNAKÇA)

Pirtûk:

BAŞGÖZ, İlhan. (1988). “Masalın Anlatıcısı”, Masal Araştırmaları, İstanbul: ART-SAN Yay.r. 25-29

CAN, Berivan. (2008). Modern Masalların Analizinde Propp Metodu. Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi.

ÇAKAR, Mehmet Sait. IŞIK, Fehim. MEHMETOĞLU, Mehmet, SADIKOĞLU. Esra, ÖNEN, Ronayi. TAN, Sami. (2010), *Ortaöğretim Kürt Dili Ve Edebiyatı Ders Kitabı*, İstanbul: Tarih Vakfı.

ÇIBLAK, Nilgün. (2005). *Propp'un Masal Çözümleme Metodu*, Türk Dili Dergisi, r.638.

DOST Jan, (2010). Mela Mehmûdê Beyazîdî, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, İstanbul, Nûbihar, r. 13-17-102

DUNDES, Alan. (2007). "Fakelore Fabrikasyonu", Folklorun Sahtesi: Fakelore, Geleneksel Yayınlar, Ankara

DÜNDAR, Hülya, (2002), "Vladimir Propp ve Masalın Biçimbilimi", Milli Folklor, C. 7, S. 55, s: 115-118.

EMMEZ, Berivan CAN. (2008). Sözlü Gelenekten Modern Masala: Çocuk Edebiyatında Masal Üzerine Halkbilimsel Bir İnceleme. Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Halkbilim Anabilim Dalı, Yüksek Lisans Tezi, Ankara.

GRİMM. (1812). *Kinder-und Hausmärchen*. Formated.

GRİMM. (2008). *Grimm Masalları*. (Çev. Nihal Yeğınobalı), İstanbul: Can Çocuk Yayınları.

GÜNAY, Umay. (1992). "Masal". Türk Dünyası El Kitabı, Ankara: Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yay. 321-331.

KIZIL, Hayreddin; TANRIKULU, Veysel. (2015). Berawirdkirina çîroka Hedlîlik Bedlîlik a bi Kurdî bi Gur û Heft Karikan a Birayên Grimm. International Journal of Kurdish Studies No. 1/2 (ISSN:2149-2751), pp.57 - 72 <http://www.ijoks.com>.

KURT, Vahide. (2012). Murathan Mungan'ın "Zamanımızın Bir Külkedisi" Adlı Öyküsünün Metinlerarası İlişkiler Bağlamında Okunması, Turkish Studies - International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Sayı:7/2 Spring, p.761-768, Ankara/Turkey

LÜTHİ, Max. (1974). *Das europäische Volksmärchen*. Bern: Francke.

MAZÎ, Çiya. 2014, “Baxek Ji Folklorê Kurdî” Weşanhaneya Berbang, İstanbul.

MERETOWAR, Ayhan. Hunera Axaftina xweş û Nivisandina Rind. Diyarbakır: Enstituya Zimanê Kurdî ya Amedê.

ÖZTÜRK, A. (1986). Türk Anonim Edebiyatı, İstanbul: Bayrak Yayınları.

ÖLÇER, Evrim. (2003). *Türkiye Masallarında Toplumsal Cinsiyet Ve Mekân İlişkisi*. Ankara: Bilkent Üniversitesi Ekonomi ve Sosyal Bilimler Enstitüsü. Haziran.

ÖZÜNEL, Evrim Ölçer. (2011). Yazının İzinde Masal Haritalarını Okuma Denemesi: Masal Tarihine Yeniden Bakmak. Ankara: Gazi Üniversitesi. Millî Folklor, Yıl 23, Sayı 91. (<http://www.millifolklor.com>).

PERTEV Ramazan. (2015) Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Weşanxaneya Awesta İstanbul.

PROPP, V. Ja. (1987). Masalların Yapısı ve İncelenmesi. Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı. (1998). Folklor Teori ve Tarih. İstanbul: Avesta.

SAKAOĞLU, Saim. (1999). Masal Araştırmaları. Ankara: Akçağ Yayınları

ŞİRİN, Mustafa Ruhi. (1998). 99 Soruda Çocuk Edebiyatı, Çocuk Vakfı Yayınları, İstanbul.

TOMKOWIAK, Ingrid; MARZOLPH, Ulrich (Hs.) (1996). Grimms Märchen International: zehn der bekanntesten Grimmschen Märchen und ihre europäischen und außereuropäischen Verwandten. Paderborn: Schöningh.

Li ser Malper:

-https://www.youtube.com/watch?v=_vT8gsScYqE. Reşad Sorgul Çîroka Çêleka Zêrîn.

Diroka Ragihandinê: 19.06.2016

https://www.bbc.com/turkce/ozeldosyalar/2015/01/150121_vert_cul_masallar

http://www.kurdigeh.com/rwdx/sitepdf/weje_bir_ibrahim_seydo_aydogan.pdf. Diroka Ragihandinê: 20.06.2016

<http://www.xebat.com/cirokakurdi.doc>. Renas Jiyan. Diroka Ragihandinê: 21.06.2016

<http://www.estanbul.com/cocuk-edebiyatinin-gelisimi-435603.html#.WGeKy9KLTIU>.

Diroka Ragihandinê: 23.07.2016

<http://www.avestakitap.com/yazar.php?id=74> Diroka Ragihandinê: 23.07.2016

PÊVEK 1:

1.Çîroka Sîndrella ya Îngilîzî

1812

Grimm's Fairy Tales

CINDERELLA

Jacob Ludwig Grimm and Wilhelm Carl Grimm

Grimm, Jacob (1785-1863) and Wilhelm (1786-1859)—German philologists whose collection “Kinder-und Hausmarchen,” are known in English as “Grimm’s Fairy Tales,” is a timeless literary masterpiece. The brothers transcribed these tales directly from folk and fairy stories told to them by common villagers. Cinderella (1812) is the famous tale of a girl who is mistreated by her evil stepmother and step-sisters but goes on to marry the prince. This, the original “Cinderella,” differs greatly from many of its modern variations.

CINDERELLA

There was once a rich man whose wife lay sick, and when she felt her end drawing near she called to her only daughter to come near her bed, and said,

"Dear child, be good and pious, and God will always take care of you, and I will look down upon you from heaven, and will be with you."

And then she closed her eyes and died. The maiden went every day to her mother's grave and wept, and was always pious and good. When the winter came the snow covered the grave with a white covering, and when the sun came in the early spring and melted it away, the man took to himself another wife.

The new wife brought two daughters home with her, and they were beautiful and fair in appearance, but at heart were black and ugly. And then began very evil times for the poor step-daughter.

"Is the stupid creature to sit in the same room with us?" said they; "those who eat food must earn it. She is nothing but a kitchen-maid!"

They took away her pretty dresses, and put on her an old gray kirtle, and gave her wooden shoes to wear.

"Just look now at the proud princess, how she is decked out!" cried they laughing, and then they sent her into the kitchen. There she was obliged to do heavy work from morning to night, get up early in the morning, draw water, make the fires, cook, and wash. Besides that, the sisters did their utmost to torment her- mocking her, and strewing peas and lentils among the ashes, and setting her to pick them up. In the evenings, when she was quite tired out with her hard day's work, she had no bed to lie on, but was obliged to rest on the hearth among the cinders. And because she always looked dusty and dirty, as if she had slept in the cinders, they named her Cinderella.

It happened one day that the father went to the fair, and he asked his two step-daughters what he should bring back for them. "Fine clothes!" said one. "Pearls and jewels!" said the other. "But what will you have, Cinderella?" said he. "The first twig, father, that strikes against your hat on the way home; that is what I should like you to bring me."

So he bought for the two step-daughters fine clothes, pearls, and jewels, and on his way back, as he rode through a green lane, a hazel twig struck against his hat; and he broke it off and carried it home with him. And when he reached home he gave to the step-daughters what they had wished for, and to Cinderella he gave the hazel twig. She thanked him, and went to her mother's grave, and planted this twig there, weeping so bitterly that the tears fell upon it and watered it, and it flourished and became a fine tree. Cinderella went to see it three times a day, and wept and prayed, and each time a white bird rose up from the tree, and if she uttered any wish the bird brought her whatever she had wished for

Now it came to pass that the King ordained a festival that should last for three days, and to which all the beautiful young women of that country were bidden, so that the King's son might choose a bride from among them. When the two step-daughters heard that they too were bidden to appear, they felt very pleased, and they called Cinderella and said, "Comb our hair, brush our shoes, and make our buckles fast, we are going to the wedding feast at the King's castle."

When she heard this, Cinderella could not help crying, for she too would have liked to go to the dance, and she begged her step-mother to allow her. "What! You Cinderella!" said she, "in all your dust and dirt, you want to go to the festival! You that have no dress and no shoes! You want to dance!

But as she persisted in asking, at last the step-mother said, "I have strewed a dishful of lentils in the ashes, and if you can pick them all up again in two hours you may go with us."

Then the maiden went to the back-door that led into the garden, and called out,

"O gentle doves, O turtle-doves, And all the birds that be,

The lentils that in ashes lie Come and pick up for me!

The good must be put in the dish, The bad you may eat if you wish."

Then there came to the kitchen-window two white doves, and after them some turtle-doves, and at last a crowd of all the birds under heaven, chirping and fluttering, and they alighted among the ashes; and the doves nodded with their heads, and began to pick, peck, pick, peck, and then all the others began to pick, peck, pick, peck, and put all the good grains into the dish. Before an hour was over all was done, and they flew away.

Then the maiden brought the dish to her step-mother, feeling joyful, and thinking that now she should go to the feast; but the step-mother said, "No, Cinderella, you have no proper clothes, and you do not know how to dance, and you would be laughed at!" And when Cinderella cried for disappointment, she added, "If you can pick two dishes full of lentils out of the ashes, nice and clean, you shall go with us," thinking to herself, "for that is not possible." When she had strewed two dishes full of lentils among the ashes the maiden went through the back-door into the garden, and cried,

"O gentle doves, O turtle-doves, And all the birds that be,

The lentils that in ashes lie Come and pick up for me!

The good must be put in the dish, The bad you may eat if you wish."

So there came to the kitchen-window two white doves, and then some turtle-doves, and at last a crowd of all the other birds under heaven, chirping and fluttering, and they alighted among the ashes, and the doves nodded with their heads and began to pick, peck, pick, peck, and then all the others began to pick, peck, pick, peck, and put all the good grains into the dish. And before half-an-hour was over it was all done, and they flew away. Then the maiden took the dishes to the step-mother, feeling joyful, and thinking that now she should go with them to the feast; but she said, "All this is of no good to you; you cannot come with us, for you have no proper clothes, and cannot dance; you would put us to shame." Then she turned her back on poor Cinderella and made haste to set out with her two proud daughters.

And as there was no one left in the house, Cinderella went to her mother's grave, under the hazel bush, and cried,

"Little tree, little tree, shake over me,

That silver and gold may come down and cover me."

Then the bird threw down a dress of gold and silver, and a pair of slippers embroidered with silk and silver. And in all haste she put on the dress and went to the festival. But her step-mother and sisters did not know her, and thought she must be a foreign Princess, she looked so beautiful in her golden dress. Of Cinderella they never thought at all, and supposed that she was sitting at home, and picking the lentils out of the ashes. The King's son came to meet her, and took her by the hand and danced with her, and he refused to stand up with any one else, so that he might not be obliged to let go her hand; and when any one came to claim it he answered, "She is my partner."

And when the evening came she wanted to go home, but the Prince said he would go with her to take care of her, for he wanted to see where the beautiful maiden lived. But she escaped him, and jumped up into the pigeon-house. Then the Prince

waited until the father came, and told him the strange maiden had jumped into the pigeon-house. The father thought to himself, "It surely cannot be Cinderella," and called for axes and hatchets, and had the pigeon-house cut down, but there was no one in it. And when they entered the house there sat Cinderella in her dirty clothes among the cinders, and a little oil-lamp burnt dimly in the chimney; for Cinderella had been very quick, and had jumped out of the pigeon-house again, and had run to the hazel bush; and there she had taken off her beautiful dress and had laid it on the grave, and the bird had carried it away again, and then she had put on her little gray kirtle again, and had sat down in the kitchen among the cinders

The next day, when the festival began anew, and the parents and step-sisters had gone to it, Cinderella went to the hazel bush and cried,

"Little tree, little tree, shake over me,

That silver and gold may come down and cover me."

